

NÛÇE Û DADKIRIN

PIRTÛKA DESTAN
A NÛÇEGIHANIYA
PËVAJOYA
DADKIRINË

Şengun Kiliç Hristidis

Nûçe û Dadkirin

Pirtûka Destan a Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê

© Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

Nivîskar: Şengun Kiliç Hristidis

Edîtor: Gokçer Tahincioglu

Wergêr: Ferid Demirel, Murat Bayram

Adar 2019

Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

Faik Paşa Yokuşu No: 37/7-8 Kat:3

34430 Beyoğlu, İstanbul

Tel: +90 212 2511503

Faks: +90 212 2511609

E-posta: bia@bianet.orgWeb Sitesi: www.bianet.org**Hesabên Medyaya Civakî**<https://www.facebook.com/bianetkurdi/>https://twitter.com/bianet_kurdi<https://www.instagram.com/bianetkurdi/>**Dîzayn****MYRA**

Ev pirtûk bi piştgiriya aborî ya Ajansa Geşepêdan û Hevkariyê ya Navnetewî ya Swêdê (SIDA) hatiye weşandin. Loma jî bi tu awayekî wek nêrînên fermî yên SIDAyê nayên nixandîn.

**NAVEROK**

Derbarê Projeyê de.....	5
Nêrîna Weqfê.....	6
Naverok.....	10
Desptêk.....	12
Çi pêwistî bi vê pirtûka destan heye?	12
Nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê çiyê?	13
Rewşa dadê.....	14
Destpêka nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê	16
Divê medya bi xwe dadkirinê neke.....	18
Pêvajo.....	21
Rêbera şopandina dozan a bianetê	21
Li cihanê nûçegihaniya dadê.....	25
Şeş xalên girîng	26
Şopandina danişinan.....	29
Lêkolîna li ser dosyeyan	31
Di nûçeyan de nivîsandina çavkaniyan	33
Şopandina hemû qonaxên bûyerê	36
Zimanê Nûçeyan û Hiqûqê.....	37
Pêngavên lêpîrsîn û pêketinê	39
Zimanê nûçeyan	41
Nûçeyên li ser operasyonan	42
Maf û Berpirsiyarî	44
Mafê rêz û hirmeta li jiyana taybet û jiyana malbatî	44
Mafê serastkirinê û bersivdanê	45
Nîşaneyên bêsûciyê	45
Yên 18 salî û jî wî emrî biçûktir	48
Şandina qayûman.....	48
Bi hevesa stajeran	49
Pêvek.....	53
Pêveka 1. / Pêngavên mihakemeya cezayî	53
Pêveka 2. / Têgehên mihakemeya cezayan	58
Çavkanî	66



Şengun Kiliç Hristidis

Rojnameger û nivîskar e. Sala 1986ê dest bi karê rojnamegeriyê kiriye. Li cur be cur rojname, kovar, radyo û kanalên televizyonan de weke nûçegihan, edîtor û midûra nûçeyan kar kiriye. Pirtûkên wê yên bi navê “Biz ve Onlar/ Türkiye’de Etnik Ayrımcılık (1992, Metis Yayınları)”, “Beyaz Bir Düş (2004, Epsilon Yayınları)”, “Sinemada Ulusal Tavır/ Halit Refiğ Kitabı (2006, İş Kültür Yayınları)”, “Erozyon Dede, Hayrettin Karaca Kitabı (2008, İş Kültür Yayınları)”, “CHP’li Yıllar 1946-1992 (2010, İş Kültür Yayınları)”, “Hayatım Mücadeleyle Geçti/Kemal Kurdaş Kitabı (2010, İş Kültür Yayınları)”, “Çayın 90 Yılı (2014, ÇAYKUR” nivîsandîye û ev pirtûkên wan hatine çapkirin. Sala 1963yê li Erzînganê ji dayik bûye. Zanîngeha Gaziyê qedandîye. Li Beşa Operayê ya Konservatûara Dewletê ya Zanîngeha Hacettepeyê xwendina xwe berdewam kiriye.

Derbarê Projeyê De

Me Projeya Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê û Azadiya Medyayê di navbera Kanûna Paşiyê ya 2018ê û Sibata 2019ê de bi piştgiriya Ajansa Geşepêdan û Hevkariyê ya Swêdê (SIDA) çêkir. Koordînatora projeyê Elif Unal e.

Em û Civil Rights Defenders bi hev re li dora maseyekê kom bûn û me civînek çêkir. Di dema vê civînê de me rojnameger, parêzer, akademisyen û mafparêzan li ser nûçegihaniya dadê nîqaş kir. Prof. Dr. Aslı Tunç bi çavê akademiyê, Gökçer Tahincioglu bi çavê rojnamegeriyê û Fikret İlkiz weke parêzerekî behsa nûçegihaniya dadê kirin û hiştin ku bingehek ji vê nîqaşê re ava bibe.

Em Pirtûka Destan a Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê / Nûçe û Dadkirin bi awayekî online diweşînin. Şengun Kiliç Hristidisê ve pirtûk nivîsandîye û Gökçer Tahincioglu yî jî edîtorê pirtûkê ye.

Nêrîna Weqfê

- *Tê çîrokan binivîse, ji bo wê tu dixwazî, ne wisa?*
- *Na ezbenî, ez hez ji edliyeyan dikim.*

Ev diyalog di salên 1950yî de li rojnameya Cumhuriyetê, di navbera Cevat Fehmî Başkut û Vasfiye Ozkoçakê de derbas dibe. Ozoçak li Tirkîyeyê weke yekem nûçegihana jin, a nûçeyên pêvajoya dadkirinê, tê naskirin. Li vir Ozkoçak ji ber gotina “çîrokê” aciz dibe.

Gelo ne ecêbe ku hîna di gava yekem de hewl dide “astengiyên derxe pêşya” rojnamegera jin? Na. Lewre ne tenê li Tirkîyeyê, li wan welatên ku rojnamegerî lê derketiye jî zayenda medyayê bi giştî hîna “mêr” e. Mijara têkoşînê ye ku jin li medyayê bikaribin di merheleyên biryarstandinê de kar bikin, mêr van deran ji xwe re qadên taybet dibînin. Her weha dema di van merhale û qadan de bikaribin cih bigirin, ev jî mijara nûçeyan e.

Piştî ku jinan dest bi nûçegihaniya edliyeyan kiriye, rê li ber wî tiştî vebûye ku tundkariya mêran bêhtir bê dîtin. Di van salan de hejmara rojnamegerên jin ên li koridorên edliyeyan ji dadgehekê baz didin

saloneke din, zêde bûye. Bi taybet jî vê bi perspektîva nûçegihaniya mafparêz dikin.

Sûc û cezakirin her wext bûye çavkaniyên nûçeyan. Ji xwe dema dîrok ber bi salên 1850yî ve tê, em dibînin ku nûçegihan êdî li qereqolên polîsan li pey nûçeyan digerin. Bi vî awayî ew dema ku nûçe ji ber bultenên polîsan ve dihat çêkirin dest pê dike. Ev nûçe bi refleksa karakterîstîk a nûçegihaniyê ya ji hêla herkesî ve hatiye qebûlkirin dihatin çêkirin. Di eslê xwe de desthilatdar ji bo otorîtêya xwe dabîn û rewa bikin, hewce dîtine ku nûçeyên derbarê sûcan û biryarên li ser sûcdaran bi raya giştî re par ve bikin. Ji bo vê jî, wê demê kîjan amûr qebûlkirî bin bi awayekî xurt ew bi kar anî ne.

Li Tirkîyeyê ji vî beşê rojnamegeriyê re nûçegihaniya nûçeyên edliyeyan/polîsan tê gotin. Li cîhanê bi navên cuda cuda tê penasekirin. Em dikarin dîroka vê cureya rojnamegeriyê ji demên kevin, heta ji roja derketina rojnamegeriyê bidin dest pê kirin. Beriya Zayînê, li Romayê nûçeyên pêvajoya dadkirinê li diwaran dihatin daliqandin û bi vî awayî bi bajarvaniyan re par ve dikirin.

Piştî Zayînê di sedsala yekem de, li Çînê raporên derbarê edliyeyan de ên ji bo rêveberan dihatin amadekirin, di nava demê de bi gel re hatine par ve kirin.

Li Tirkîyeyê nûçegihaniya nûçeyên edliyeyan û bûyerên polîsan salên dirêj, rêyeke bingeîn bû ji bo fêrbûna rojnamegeriyê. Her çiqas ku niha rêya wê guherî be jî, ji bo rojnameger bikaribin bibin berpîrsên weşanê yê giştî, nûçegihaniya edliyeyan û bûyerên polîsan dikirin. Çavkaniyên nûçeyan bêhtir bultenên polîsan û yê ji edliyeyan dihatin belavkirin û daxuyaniyên fermî bûn. Dema wisa dibe, nûçe ne li gorî maf û azadiyên welatîyan tî nivîsandin. Lê li gorî wê nêrînê tî nivîsandin ku man û nemana dewletê di ser her tiştî re digire, alîgiriyeke hegemonîk a militarîst û seksît diparêze. Nûçe bi xwe dibin amûra bînpêkirina mafan. Ev rewş duh mirov nedibehitandin. Îro qet nabehitîne.

Di nava demê de ji ber ku kar zêde bûn, du beşên pîsporiyê derketin holê. Yek jê nûçegihaniya bûyerên polîsiyê û ya din jî nûçegihaniya edliyeyan e. Di eslê xwe de dibe ku em vê, weke pîsporiyeke ji sê beşan pêk tê binav bikin wê rasttir

be: rasthatina li polîsan, dadkirin û girtin/zindanîkirin. Bi vî awayî dibe ku “berdewamiya şopandina bûyeran” jî hêsantir û guncavtir bibe. Di pratîka medyaya serdest de herî zêde di nûçeyên edliyeyan û bûyerên polîsan de bînpêkirinê mafan ên mezin çêbûne. Ji xwe yek ji wan sedemên sereke yê ku hişt di serê sala 2000î de, em di mijarên Nûçegihaniya Aştîxwaz, Nûçegihaniya Jinparêz û Nûçegihaniya Zarokparêz de perwerdeyê pêşiyê bidin rojnamegerên herêmî, paşê jî xwendekarên fakulteyên ragihandinê û di van mijaran de pirtûkên destan derbixin, ev bû.

Li Tirkîyeyê guhertinê mezin di siyasetê û rojnamegerî de çêbûne. Ne ku ez dibêjim beriya niha rewşeke baş a her du qadan hebû. Tirkîye welatekî wiha ye ku “her ji sê yekan kesek tê dadkirin”. Rojnameger jî li qereqol, edliye û dadgehan li pey nûçeyan e. Li gel rojnamegeriyê weke bersûc, gumanbar, cezaxwar, piştevan û sûcdarê potansiyel li navendên polîsan û koridorên edliyeyan e.

Li Tirkîyeyê bi salane ku polîs di destê sibê de digirin ser malan, heta destê sibê jî lêpîrsînan dikin. Girtîgeh zêdeyî hedê xwe tiş

bûne. Ji bo çûna edliyeyan mirov dikevin rêzên dûr û dirêj. Xalên qanûnan, delîl û îdianameyên ku dikarin bibin şîrk, bi gotinên weke “endamê/a rêxistinê”, “propagandaya rêxistinê kiriye” û digel ne endam e jî...” dest pê dikin û ji bo hemû helwestên politîk tîn bi kar anîn.

Êdî medya hima bêje dibe yekdem lê ji bo çêkirina nûçeyên dozên girîng li gor rewşê dikarin bédeng û gilîker be. Bê hed û pîvan alîgiriya wan, înfazkirina bê pirs û dad û nûçeyên wan ên derew li ber çavan in. Rojnamegerên ku nûçegihaniya mafparêz dikin gelek caran –heke nehatibin girtin- li hêlekê dozên li dijî xwe hatine vekirin, li hêla din jî dozên li ser “maf û azadiyê” hatine vekirin ku hejmara wan bi zelalî nayê zanîn, dişopînin

Bi kurtasî, ti wextê hewcedariya bi nûçegihaniya ku li Tirkiyeyê şopandina nûçeyên mafparêziyê dike weke vê demê nebûye. Em weke Weqfa Ragihandinê ya IPSyê vê xebata ku li ber destê we ye bi vê hewcedariyê çêdikin. Weke ku ji navê pirtûka me jî tê famkirin, ji bo pisporiya derbarê hemû pêvajoya rашthatina li polîsan, dadkirin û cezaxwarin/girtinê de, him jî ji bo ji nûçegihaniya ku dibe sedema binpêkirina gelek mafan cida bibe me têgeha “Nûçe û Dad”ê

hilbijartiyê. Nûçegihaniya ku dibe sedema binpêkirinan herweha refleksên nûçegihaniya bûyerên polîsan û yên li edliyeyan jî di nava xwe de dihewand. Bi taybet em li bersiva wê pirsê geriyan ku wê nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê ya mafparêz çawa bê kirin. Ev cure nûçegihanî jî hêla nav û dezgehên medyayê yên sistêmê ew avêtine kêlekekê ve di nava şert û mercên siyasî û yên medyayê heyî de tê kirin.

Em weke xwendekaran di nava rewşeke bi pirsgirêk a bidestxistina nûçeyan de ne. Em weke rojnamegeran jî di nûçegihaniyê di bi israr in. Yanî di mafê nûçewergirtinê, di parastina azadiya çêkirina nûçeyan de û di nûçegihaniya mafparêz de berdewam in. Tenê em nûçeyên xwe li gorî pîvanan çêbikin û tomar bikin.

“Pirtûka Destan a Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê/ Nûçe û Dadkirin” weke e-pirtûk li Pirtûkxaneyê BIAyê ya Weqfa Ragihandinê ya IPSyê tê barkirin. Ev pirtûka destan di tirkî û kurdîyê de wê bibe mînak yekem. Ji ber ku e-pirtûk e wê her gav li ber destan be û peyda wê hêsan be. Her weha dê derfetê bide ku kêmasî/pirsgirêkên ji ber yekembûnê derkevin holê demildest ji holê rabike.

Hevala me ya rojnameger Şengul Kiliç Hristidisê pirtûka “Nûçe û Dadkirin”ê nivîsandiyê. Hevalê me Gokçer Tahîncioğlu, nûçegihanê pisporekê nûçeyên pêvajoya dadkirinê ji bo weşanê amade kiriye. Ferid Demirel û Murat Bayram, edîtor-wergêrên bianet kurdîyê wergera wê ya kurdî kirine. Weke her pirtûkê Pirtûka “Nûçe û Dadkirin”ê jî di encama xebateke kolektîv de derketiye holê. Ji bo Evren Gonul, Koordînatore Projeyan; Elif Unal, koordînatore Projeya Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê, Fikret İlikiz şêwermindê me yê hiqûqî û Prof. Dr. Sevda Alankuş şêwirmenda me ya perwerdeyê, ji kesên ji BIA/bianetê û ji derve di amadekirina vê xebatê de karê me hêsan kirine, em spasîyên xwe yên taybet pêşkêşî wan dikin.

Sedemên gelek mafdar ên jinan –û hemû bindest/têkoşeran- heye ku pêvajoya nûçekirina dadê, bêcezahiştinê û hemû qadên têkildar weke “pirsgirêk binirxîne”, bi heman awayî yên IPSyê û bianetê jî hene.

Di dema qedandinê de ez ê dîsa behsa mînak li destpêkê bikim. Divê em îtiraza Vasfiye Ozkoçak, yekem nûçegihana jin a nûçeyên li edliyeyan ji bîr nekin ku li hemberî “çîrokê” xwe dispart nûçeyan. Helbet divê em ji bîr nekin ku ji hêla polîtîk û etîkê ve rojnamegeriya mafparêz a bi berpirsiyar, tenê rêzdariya li hemberî bi rêzik û norman çênabe. Dîsa divê neyê jibîrkirin ku heke nûçegihan him mijar him jî encamên wê “weke pirsgirêk nebîne”, nikare pêvajoya dadkirinê bişopîne...

Nadire Mater
Adara 2019ê

Pêşgotin

Dema Weqfa Ragihandinê ya IPSyê pêşniyar li min kir ku ez li ser mijara nûçegihaniya pêvajoya dadkirinêde pirtûkekê binivîsim, pêşiyê bextewer bûm. Lê dema min dest bi xebatê kir, min dît ku li ser serê min ewrên reş û tarî kom dibin. Gelo divê min behsa çi bikira? Di rewşeke wisa de ku di nava hiqûqê de gelek bêhiqûqî heye, min ê behsa kîjan qaîdeyan û kîjan kevneşopiyên bikira.

Ez gelekî ponijîm. Paşê min rêyeke wiha dît: D. N. Ş. A. D.! Min ew tiştê ku ji dema lîseyê de di hişê min de maye ji xwe re kir rêber, “di nava şertên asayî de”. Min qebûl kir ku germahî 0°C ye û min guvaş weke 1 guvaşa atmosferê qebûl kir.

Di serî de divê ez wan hembîşeyên xwe yên di vê demê de nûçegihaniya dadê dikin pîroz bikim. Ji ber şert û mercên vê dema ku em tê de ne, karekî gelekî zehmet bi serkeftî pêk tînin. Ez ji dil dixwazim ku karê hembîşeyên me yên nû dest pi vî karîdikin, bi hêsanî bimeşe. Di demeke wisa de dest bi karkirinê kirine ku gelek zehmetî tê de hene

û di vê demê de ji ber sazkirina nû ya di medyayê de xelesa di navbera hoste û şagirtan de qut bûye, bêsistemiyeke wisa heye ku li qada hiqûqê kêfîti di asteke gelekî bilind de ye.

Ew hembîşeyên me yên ku nû dest bi kar dikin wê weke me hemûyan di nava demê de xwe bi pêş bixin, rê û rêbazên lêkolîna dosyayên dozan, nixandina delîlan û têgihiştina zimanê dadgehan bibînin.

Ez dixwazim ku biçûk be jî ev pirtûka di destê we de alîkariyekê bi we bike. Lê ji derveyî van tiştan, divê ez bibîra hembîşeyên me yên ciwan ên ku wê vî karî bikin bixim ku divê, bivê nevwê wan hay ji zanyariyên hiqûqê yên bingehîn hebe.

Hestên me yên derbarê gumanbar/bersûcî de çi dibin bila bibin, divê em ji bîr nekin, xala herî bingehîn ew e ku heta pêvajoya hiqûqî/ dadkirinê temam nebe, nabe em ji xala şana bêguhênîyê bi paş de gavê biavêjin. Dema ev xala bingehîn ji hêla siyasetmedaran an jî hin endamên dadgehan

ve were binpêkirin jî, divê weke rojnamegereki/ê em heta dawiyê li gorî vê xalê tev bi gerin.

Li gorî daneyên lêpîrsîna Barometreya Edaletê ya Zanîngeha Bilgiyê¹ welatî, zanyariyên derbarê dadkirinê de herî zêde ji çapemeniya nivîskî û ya dîtbarî werdigirin; divê em vê zanyariyê qet ji bîr nekin.

Her nûçeyêke ku bêyî lêkolîneke têr û tijî em çê bikin an jî em li gorî hestên xwe yên wê demê binivîsin, dibe bibe sedema wî tiştî ku di

encama jêpîrsînê de doz li wan kesan neyê vekirin. Li eksî wê bibe sedem ku navek bi pê keve.

Bi heman awayî, dibe ji ber ku me karê xwe baş nekiribe, mirovekî/e divê bê dadkirin û ceza lê bê birîn, di nava rewşa siyasî ya wê rojê de bi awayekî hêsan karên xwe yên berê berdewam bike.

Gotina dawiyê: Divê em medyayê nekin dadgeh û dadkirinan li wir nekin, doz li edliyeyan tên meşandin.

Şengun Kiliç Hristidis

1 Adalet Barometresi: Vatandaşların Mahkemeler Hakkındaki Görüşleri ve Değerlendirmeleri, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, Sibata 2008ê.

Destpêk

Çi pêwistî bi vê pirtûka destan heye?

Rojnamegerî pişeyeke wiha ye ku bi danûstandina tecrubeyên dersdêr û şagirtan re pêş dikeve. Rojnamegerên li qadê ji hembûşeyên xwe yê xwedî tecrube, hîn dibin ku wê vî karî çawa bikin. Lê di çend salên dawiyê de guhertin çêbûne, dezgehên medyaya li Tirkiyeyê dest guhertine, rojnamegerên xwedî tecrube bilez û bez ji kar hatine derxistin û bi heman awayî navendên nûçeyan hatine biçûkkirin. Ji ber van sedeman êdî ragihandina van tecrubeyên ku em behs dikin di asta herî nizm de çêdibe. Li cihana medyayê rewş bi vî awayî ye. Lê li dadê kar gelekî gelekî zêde bûye. Di rewşeke wiha de pêwistî bi rojnamegerên pispor heye ku bikaribin dosyayên

berfireh bi hurgilî binirxînin, dozên dirêj ku bi sedan kes tê de tên dadkirin gav bi gav bi şopînin.

Ev pirtûka destan armanc dike ku, digel hemû şert û mercên zehmet jiyana nûçegihanên vî karî bi fedekariyê mezînin dikin, hêsan bike, dema nûçegihanên li dadgehan û edliyeyan kar dikin li ser mijarekê dudilî bibin, rêyekê li ber wan veke, nehêle şaşiyên ji rêzê lê yê binyadî bîn kirin û tecrube bi awayekî pratîk bîn ragihandin. Pirtûk her weha ji bo nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin û yê dixwazin vî karî bikin, behsa wî tiştî dike ku wê çawa vî karî bikin û şaşiyên ku tên kirin dubare nekin.

Nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê çiyê?

Di rojnamegeriya Tirkiyeyê de têgeha “nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê” ji sala 1980yî û pê de hatiye bi kar anîn. Nûçegihaniya nûçeyên derbarê bûyerên polîsiye-nûçeyên edliyeyan a klasîk dihişt ku nûçegihanek li

ser her du mijaran jî nûçeyan çêbike. Vê rewşê dihişt ku rojnamegeriyêke serpillî ya tenê behsa bûyerên rojane bike derkeve holê. Endustriya Medyayê ji sala 1980yî û pê de dest bi guherandinê kiriye.

Vê guhertinê hiştiye ku rê li ber modelên rojnamegeriyê yê li ser hîmên pisporiyê bilind dibin vebe.

Ev guhertina di modelên rojnamegeriyê de û dadkirinên li dadgehên rêveberiya awarte yê 12 Îlona 1980yî di heman demê de çêbûne. Bi vê re pêwistî bi nûçegihanên pispor ên edliyeyan çêbû ku karê wan tenê li edliyeyan û dadgeha Bilind şopandina dozan bûya. Li Tirkiyeyê bi taybetî piştî ku pêşketinên mezînin di warê darazê de çêbûn, hewce kir ku piştî salên 1990î li gel edliyeyan, dezgehên bilind ên darazê jî bi awayekî berfireh werin şopandin. Hejmara kesên li navendên nûçeyan kar dikirin zêdetir bû û bi vê re nûçegihanên nûçeyên edliyeyan û yê bûyerên polîsan ji hev cuda bûn, behsa du qadan hate kirin ku yek jê nûçegihaniya edliyeyê yek jî ya li ser dadkirinê ye.

Di encama vê pêvajoyê de, nûçegihanên ku bi qasî hiqûqnasekî ji kar fam dikirin, hûrgiliyên dosyayan dizanîn, amadekariyên yasayên nû dişopandin, kurtejiyana navên girîng ên di darazê de nas dikirin,

hûrgihiyên hiqûqî dizanîbûn û nûçe li gor van esasan dinivîsandin, weke “nûçegihanên ku nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê çêdikin” hatine binavkirin. Piştî ku hejmara dozan zêde bû û darazê rojev diyar kir, li navenda nûçeyan cihê nûçegihanên ku di vî warî de kar dikin, girîngtir bû.

Nûçegihanên ku nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin û nûçegihanên nûçeyên edliyeyan û yê bûyerên polîsiye çêdikin heman karî dikin. Dibe ji ber rewşa ku li welêt guherî ye pêwistiya zanyariyê jî guherî be. Ev cudahiya di navbera her du beşan de ye. Nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê ya di salên 1990î û 2000î de bi pêş ketiye, di encama guhertinên di medyayê de û têkiliya di navbera rewşa nû ya medyayê û rastiyê de, salên dawiyê zêde zêde lawaz bûye. Nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin ji kar tên derxistin, bi vê re ji rojnamegerên ciwan tê xwestin ku nûçeyan tenê bi şopandina danişînan û dosyayan çêbikin. Vê rewşê, weke me berê jî diyar kir, hiştiye ku ragihandina tecrubeyan ên di navbera hoste û şagirtan de ji holê rabe.

Bi tohmata gumanbariyê” kiryarên hiqûqî li ser **7 milyon û 857 hezar** kesan hatiye pêkanîn.

(Midûriyeta Giştî ya Tomarkirinên Edlî û ya Îstatistikan, 2017)

Serê dozgerî hezar û 963 dosya, serê dadwerî jî 929 dosya ketiye.

(Midûriyeta Giştî ya Tomarkirinên Edlî û ya Îstatistikan, 2017)

16 hezar û 348 doz ji ber “istismara cinsî ya li ser zarokan” hatine vekirin

(Midûriyeta Giştî ya Tomarkirinên Edlî û ya Îstatistikan, 2017)

259 hezar û 327 kes girtî hene; **201 hezar û 120** heb ji wan hukumxwar in, 58 hezar û 207 kes jî girtî ne.

(Wezareta Dadê, Çiriya Paşiyê ya 2018ê)

246 hezar û 69 mêt, 10 hezar û 245 jin, 3 hezar û 13 zarok girtî ne

(Wezareta Dadê, Çiriya Paşiyê ya 2018ê)

19 hezar û 277 jê zarok, bi giştî ji bo 474 hezar û 507 kesan biryara serbestiya di bin kontrolê de hatiye dayîn

(Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan, Çiriya Pêşiyê ya 2018ê)

388 girtîgeh hene ku cihê **213 hezar û 186 kesan** li van deran heye Lê 46 hezar û 141 girtiyên zêde li van girtîgehan tên girtin

(Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan, Çiriya Pêşiyê ya 2018ê)

Tirkiye li cîhanê di listeya **serjimara girtiyan de piştî DYA, Çîn, Brezilya, Rûsya, Hidistan, Tayland û Endonezyayê** di rêza heştan de ye

(World Prison Brief 2018)

Li Tirkiyeyê her ji 100 hezar kesan 288 kes girtî ne Li cîhanê ev hejmar her ji 100 hezar kesan 145 kes e

(World Prison Brief 2018)

Li girtîgehan her serê fermanber-fermanbarekî/ê

3.7 girtî hene

Li Komara Makedonyaya Bakurî ev hejmar 4 e û Makedonya bi vê hejmarê li Ewropayê di rêza yekem de ye Tirkiye jî di rêza duyem de ye

(Konseya Ewropayê, 2018)

Sala 2017ê 57 ya 2018ê 44 girtiyan xwe kuştiye

(Wezareta Dadê, Çiriya Paşiyê ya 2018ê)

Serê doktorekî/ê 845 girtî dikeve Li her girtîgehan doktor nîne

(Ceza Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan, Sibata 2018ê)

Heta 31 Kanûna Pêşiyê ya 2018ê **123 rojnameger girtî bûne** 36 ji wan bersûc, 29 ji wan gumanbar, 31 mehkûm û 27 kesan jî ceza xwarî ye **73 ji van rojnamegeran** ji ber doz û lêpîrsînên derbarê “FETO”yê di girtîgehan de tên girtin, 36 jî ji medyaya kurdan in.

(BIA Rapora Cavdêriya Li Medyayê ya BIAYê, Çiriya Pêşiyê ya 2018ê)

Hezar û 848 xwendekar girtî ne

(Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan, Çiriya Pêşiyê ya 2018ê)

Temenê 3 hezar û 269 girtiyan **ji 65ê berjortir e, 248 girtî astengdar in. Herî kêr 200 LGBTI** di girtîgehan de ne.

(Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan, Çiriya Pêşiyê ya 2018ê)

Rewşa 402 jê giran 1 hezar 154 girtî nexweş in.

(IHD, Adara 2018ê)

Destpêka nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê

Her kes bi taybet jî kesên biryar dane ku bibin nûçegihanên pêvajoya dadkirinê xwezî romana Rûmeta *Katharina Blumê ya ku hatiye Binpêkirin*² Heinrich Böllî bixwînin.

Roman behsa jiyana Katharina Blumê dike ku jiyana wê berê gelekî asayî bûye. Di pirtûkê de behsa wan guhertinên di jiyana Blumê de tê kirin ku bi weşandina nûçeyên derew re, Blum di çavê dewlet û civakê de çawa dibe weke “terorîstekê”. Blum şevêke li gel anarşîstekî bûye ku polis li wî anarşîstî digere. Wernerg Tötges nûçegihanê *Zeitungê* li ser wê nûçeyên sansasyonel belav dike û Blum rastî reşkirinê tê. Di vê pêvajoyê de hemû hurgiliyên jiyana wê yên taybet tî weşandin. Her weha dewlet û civak jî piştgiriya vê reşkirinê dikin û wê dixin rewşeke wisa ku nikare li hemberî nas û dostên xwe yên nêzîk jî xwe biparêze.

Di pirtûkê de rexne him li medyayê tê kirin ku bi nûçeyên derew ji

2 Böll, Heinrich, *Katharina Blum'un Çiğnemen Onuru*, Can Yayınları, İstanbul, 2013

nirx û etîka rojnamegeriyê dūr dikeve, him jî li dewletê tê kirin ku bi hinceta “şerê bi terorê re” rêbazên antîdemokratîk bi kar tîne. Böllî ev pirtûk sala 1974an nivîsiye lê ji bo Tirkiyeyê hîna jî weke ku nû hatibe nivîsandin. Mijara “li hemberî jiyana taybet berpirsiyariya medyayê” mijareke wiha ye ku divê îro jî em bi israrê mijarê nîqaş bikin.

Hejmara desteserkirin-girtin-mahkûmkirinan zêde bûye, em ji vê rewşê tê derdixin ku vê demê kar û barên nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin, zêde ye.

Piştî hewldana derbeya 15ê Tîrmehê û ragihandina Rewşa Awarte ya ku du salan berdewam kir ev kar û bar zêdetir bûye. Ji rêzê ye ku êdî nişaneyê

bêgunehiyê bê bînpêkirin û bêyî ku ceza li wan bê birîn mirov demeke dirêj di girtîgehan de bimînin. Di ser de jî yek ji pîvanên bîngêhî ên rojnamegeriyê yanî israrkirin, weke “alîgirî” tê dîtin.

Di roja me de medya hema hema bûye yekdem. Vî tiştî bandor li ser nêrîna li hemberî edaletê kiriye û hiştiye ku ev nêrîn zerarê bibîne. Ji vê jî xerabtir hiştiye ku li derveyî rêzikên nivîskî, nêrîneke din li ser edaletê çêbibe.

Prof. Dr. Aslı Tunç, di xebata xwe ya bi navê “Li Tirkiyeyê Pêşkêşkirina Nûçeyên Derbarê Darazê yên Çapemeniya Nivîskî”³ de behsa hêza nûçeyê dike. Ev nirxandin îro jî derbas dibe:

“(Walter) Lippmann di wan bûyeran de balê dikişîne ser hêza bibandor a navgînên ragihandinê ku gelek ji me rasterast nebûne şahidên wan û rasterast têkiliyeke me bi wan re nebûye. Di vê qonaxê de ya girîng ne tenê ew tişt e ku kesên mesaj gihîştî wan bertekekê bidin. Li gel vî tiştî heke di encama bûyereke ku bi xwe şahidî lê nekiribin de, di mejiyên wan de fikrek çêbibe, ev jî girîng e.

3 Tunç, Aslı, *Türkiye’de Yazılı Basının Yargıya İlişkin Haberleri Sunumu*. Kalem, Seda (der.), *Adalet Gözet: Yargı Sistemi Üzerine Bir İnceleme*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Sayı 283, Kanûna Pêşiyê ya 2009ê.

Divê medya bi xwe dadkirinê neke

Di pêvajoya ku nûçegihaniya bûyerên polîsan-edliyeyan veguhestiya nûçegihaniya pêvajoya dadê de pirsgirêka herî mezin a ku çareserî jê re nayê dîtin ew e; li şûna bi hemû hêlên wê nûçeyê bi weşîne, nûçegihan xwe dixwe şûna kesên ku biryarê didin û li gel dadgehê ew bi xwe dadgehekeke din ava dikin.

Pêvajoya dadkirina Selahattîn Demîrtaş, Hevserokê berê yê Partiya Demokratî a gelan (HDP) û ya Osman Kavala, karsaz û mafparêzê di mînak in ji bo vê mijarê. Bêyî ku pêvajoya dadkirina her du kesan bi qede, li medyayê dadgeh hatine avakirin û ceza li wan hatiye birîn.

Îdianameya Kavalayî hîna nehatiye amadekirin ku ji 1ê Çiriya Paşiyê ya 2017ê û vir ve di Girtîgeha Sîlvîriyê de tê girtin.^{4, 5}

Nayê zanîn ku Kavala bi çi tê tohmetkirin. Lê ji zû de ey ku medyayê dadkirina Kavalayî kiriye û ew mehkûm kiriye.

4 Osman Kavala'ya Özgürlük, <http://www.osmankavala.org/tr>, 13ê Sibata 2019ê hatiye bi destxistin.

5 Dema ev Pirtûka Destan dihate amadekirin, 30. Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê îdianame bi navê "Îdianameya Geziyê" di 4ê Adara 2019ê de qebûl kiriye. Dadkirin wê 24ê Hezîrana 2019ê li Sîlvîriyê çêbibe.

Parêzer Fikret İlkiz: "Divê nehêlin beriya dadkirinê, hîna di qonaxa lêpîrsînê de zanyariyên ziyandar bi raya giştî re par ve bikin. Beriya amadekirina îdianameyê hûn nûçeyên wiha çênekin ku bi wan berê civakê pê bê guhertin. Ez zelaltir bibêjim. Dadkirin li edliyeyan çêdibin. Hûn li medyayê dadgehan ava nekin."⁶

6 İlkiz, Fikret, Avukat Gözünden Yargı Haberciliği, 17 Ağustos 2018, <http://bianet.org/bianet/medya/200057-avukat-gozunden-yargi-haberciligi?bia-source=rss>, 13ê Sibata 2019ê hatiye bidest xistin

2yem Daîreya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) biryar da ku mafên Selahattîn Demîrtaş, Hevserokê Giştî yê berê yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) hatine binpêkirin. Di encama vê biryarê de, yekem care nûçe dihate çêkirin û dihate gotin, DMMEyê biryar daye û diyar kiriye ku dadkirina Demîrtaşî siyasî ye. Ji ber bandora daxuyaniyên hikûmetê, hat nîqaşkirin ku gelo biryareke tekez hatiye dayîn an na. Hat pîrsîn ku "Ev biryar rê li ber tehlîyeya Demîrtaşî vedike yan na". Ji ber ku medyayê kêma nûçe çêkirin hemû aliyên biryara DMMEyê weke nûçe nehatin belavkirin. Ji ber ku ev nehate kirin, medyayê mijar di navbera tehlîyeya Demîrtaşî û berdewamiya girtîtiya wî de nîqaş kir û weke nûçe weşand.

Dem a ku nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin nekarîbin bûyeran bi her hêlên wê ve bikin nûçe, ji bo mijarê baş fam bikin û ravekirinê divê ji hiqûqnasekî bixwazin ku şîroveyê bike.

Ew bendewarî nîne ku nûçegihanen bi qasî Riza Turmen, Dadwerê DMMEyê yê berê hiqûqê bizanibe. Lê divê zanyariyên esasî ên derbarê berpirsiyariya peymanên navnetewî de bizanibe.

"Daîreya 2yem a DMMEyê vî tiştî dibêje: 'Rewşa girtîtiyê ya ku li dijî hiqûqê ye û ji ber sedemên siyasî hatiye standin heye. Divê di zûtirîn demê de dest ji vê binpêkirinê berdin. Heke na, wê ev rewşa dijîhiqûqî berdewam bike..

"Ev biryar, biryareke demkî ye. Ji ber wê ye ku tekez e û ya dawiyê ye. Her weha Daîriye 2yem biryara xwe ya ku digot divê Demîrtaş demildest serbest bimîne, li gorî Xala 46ê ya Girêbestê daye. Ev xal dibêje ku 'berpirsiyariya biryaran heye'. Bi vê xalê re dewletên aliyên Girêbestê tekez dikin ku ew ê li gorî biryaran tev bi gerin. Ev berpirsiyareyêke wiha ye ku Girêbest li aliyên bar dike."⁷

Divê nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê dişopînin nivîsên li ser hiqûqê yên di rojevê de bixwînin. Ev wê nêrîna wan a derbarê mijarê de xurt bike. Bi kurtasî ji bo ku nûçeyên şaş çênekin, ji bo nûçeyên wiha çênekin ku di rojên pêş de ji ber wan fedî bikin, hîyerarşîya hiqûqê jî di nav de rêzikên hiqûqa bingehîn bizanibin.

7 Turmen, Rıza, Hukuk Devletinin Sonu, 2yê Kanûna Pêşiyê ya 2018ê hatiye bidest xistin, <http://t24.com.tr/yazarlar/riza-turmen/hukuk-devletinin-sonu>.

Mixabin hîna jî ew îfade/belgeyên destpêkê yên ji polîsan tîn wergirtin, weke ku rast bin di dema nivîsandina nûçeyê de tîn nivîsandin.

Derbarê kesên ku hîna dadkirina wan neqediya zanyarî weke ku hatibin dadkirin û ceza li wan hatibin birîn, di nûçeyan de tîn nivîsandin.

Di dawiya dawî de xwendekarên kf fakulteyên ragihandinê qedandine û dixwazin nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê bikin, divê formasyona hiqûqê werbigirin an jî kesên ku fakulteyên hiqûqê qedandine divê li fakulteyên ragihandinê masterê bikin. Bi vî awayî wê nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê hêsantir û kalîteya nûçeyan bilintir bike.

Ev tişt “di nava şert û mercên asayî de wiha ye!” Helbet mirov dikare ji hêla pîşeyî ve bi hewldanên şexsî xwe her gav bi pêş bixe, kêmasiyên xwe ji holê rake. Lê divê ew kesên di vî warî de kar dikin bizanibin ku gereke hewldana wan ji yên li qadên din kar dikin bêhtir be. Heke hewl nedin nikarin kêmasiyên xwe ji holê rakin.

Pêvajo

“Rêbera şopandina danîşinan” a bianetê

“Rêbera şopandina danîşinan” a xebatkarên bianetê amade kiriye, her gav tî nûkirin û dibe fêdeyê li wan kesan bike ku nû dest bi vî karî kirine.

Amadekarî

- Li gorî encama wê ji danîşinê derkeve, beriya danîşinê divê nûçeyek bê çêkirin ku behsa pêvajoya dadkirinê bike.
- Nûçegihanê ku wê danîşinê bişopîne, beriya danîşin dest pê bike, divê tevî notên behsa hîm û zanyariyên bingehîn ên derbarê dadkirinê de dikin, nûçeyêke nû li panela rêveberiyê veke.
- Nav û hejmara dadgeh û edliyeya ku dadkirin lê tî kirin (mînak; Edliyeya..., 16em Dadgeha Cezayê Giran), hejmara bersûcên girtî/yên ne girtî, navên wan, heke peywendiya wê bi dadkirinê re hebe erka wan, kar û barên wan (mînak; edîtor, midûr), çiqas wext e ku girtî ne, îdiayên derbarê wan de (di nava neynûkê de tî nivîsandin) û xalên qanûnan divê li wan agahiyan bî zêdekirin.
- Çi bûbû: Di vir de divê behsa wan bê kirin ku rewşa dadkirin, sedema dadkirinê, dadkirin kengî bûye, pêvajoya lêpîrsînê, zanyariyên derbarê îdianame (bersûc, kesên gilî kirine, tohmet, cezayên ku

!
Rojnameger divê her rewşê di nava şert û mercên wê de binirxîne û nûçeya xwe bi vî awayî saz bike. Di nivîsandina nûçeyan de tenê yek rêbaz nîne.

tî xwestin) û dozê de, hejmara danîşinan, dadkirin di çi astê de ye (mînak; li bendî nêrîna dozgerî ne) rewşên ku derketine pêş, biryara tehlîyeyê û hwd. tî de hebe.

- Beriya danîşinê tekez derbarê dadkirinê de divê li ser înternetê zanyarî bî komkirin. Îhtimal heye ku hin biryarên hatine dayîn, beriya danîşin çêbibin, ji hêla hin dezgehên medyayê ve weke nûçeyên bî belavkirin.
- Divê navê aliyan û parêzerên wan, detayên navnîşanên wan bî zanîn.

Danişîn

- Nûçegihan divê pê nûs, lînûs, telefon, komputer/tablet, amûra şarjîkirinê, powerbank, modem/WIFI ya bêtêl û seyar, kamera, wênêkêş li gel xwe bibe. Divê bataryayên kelûpelan kontrol bike; divê telefon, kamera, wênêkêş û komputerê şarj bike û wiha biçe danişînê.
- Nûçegihan divê beriya danişîn dest pê bike, li edliyeyê, li ber deriyê dadgeha ku wê danişîn lê çêbibe amade be. Salonên dadgehan bi giştî biçûk in, li hemberî ihtimala ku nûçegihan nekaribe bikeve hundir, divê beriya dadgekîrîna dest pê bike, li ber deriyê dadgehê be.
- Beriya hin dadgekîrînan, daxuyanî ji bo çapemeniyê tên dayîn. Ev daxuyanî divê weke nûçeyê cuda bê weşandin.

Nûçeyêke mînak:

Hevalên Hrantî: Ne beşek ji rastiye em hemû rastiye dixwazin

Hevalên Hrantî, beriya 19em danişîna doza kuştina Hrantî dîsa li ber Edlîleya Çaglayanê li hev kom bûn
Elif Akgül- Navenda Nûçeyan a BIAyê- 29 Kanûna Paşiyê ya 2018ê

- Dema nûçegihan zû biçe ber avahiya edliyeyê wê bikaribe bi wan kesên ku ji bo piştewaniyê hatine, bi aliyên re biaxive, wan nas bike û nêrînen wan bipirse.
- Di hin dadkirînan de kesên beşdarî danişînan dibin jî divê di nava nûçeyê de bîn nivîsandin.

Şopandin

- Tiştên di paraznameyê de hatine nivîsandin, yên di dema îfadeyê de hatine gotin û daxuyaniyên ku hatine dayîn, bi hevokên kurt divê bîn nivîsandin. Ev şêwe him ji bo nivîsandinê hem jî ji bo xwendinê şêweyê hêsan e.
- Hûrgiliyên derbarê rewşa li danişînan dema di nûçeyan de bîn nivîsandin, wê bihêle ku nûçe baştir bîn famkirin.
- Heke di danişînê de rewşeke ne asayî derket holê û divê ew tişt demildest bibe nûçe, divê nûçegihan û edîtor hev agahdar dikin û nûçeyê çêbikin. Dema ku nûçeyê esasî ya danişînê bê çêkirin, divê peywendî di nava her du nûçeyan de bê girêdan û nûçe wiha temam bibe.

Nûçeyêke mînak:

“Evren bila dest û lingên te ne lerizin, were vir!”

Berfo Kirbayira ku kurê wê Cemil bi îşkenceyê hatiye kuştin di dema dadkirina doza 12ê Îlonê de axivî ye û hiştiye ku herkes bigirî: “Kenan Evren dema te kurê min kuşt qey te qet şerm nekir!”; ji ber ku Evren neaniye salona dadgehê bertek nîşanî dadwer jî daye.

Serhat Korkmaz - Navenda Nûçeyan a BIAyê- 05ê Nîsana 2012ê

- Hin caran beşa ku “derbarê” bersucî/an de tê çêkirin,

zanyariyên zêdetir didin.

Di nûçeyê de daxwaz, mitalaeya dozgerî, biryarên demkî, bendewariyên di danişînê pêş de û dîroka danişîna pêş divê bîn nivîsandin.

- Beşa “Çi bûbû” piştî her nûçeyê tê nûkirin.
- Nûçegihan nûçeyê diweşîne.

Edîtorê li ofîsê ye

- Di nûçeyê de lezandin gelekî girîng e. Nûçegihan ji cihê bûyerê, ji edliyeyê, ji salona dadgehê zanyariyan radigihîne û nûçeyê çêdike. Li navendê, edîtor, zanyariya ku hatiye ragihandin divê ji bo weşanê amade bike. Ji ber wê ye ku beriya çûna nûçeyê, divê nûçegihan û edîtor li ser nûçeyê li hev bikin.
- Nûçegihan divê derbarê doza ku wê bişopîne de zanyariyan berhev bike. Heke ku hewce bike, divê nûçeyê xwe ya ku wê bi du sê tiştên nû bê temamkirin di komputera xwe de amade bike û ji edîtorî re bişîne.
- Edîtor berpîrsê rewşa dawî ya wê nûçeyê ye û divê wê bixwîne, kontrol bike û kêmasiyên wê yên rastnivîsînê û gramêrê sererast bike. Dema nûçegihan li dagehê be û pêşketinê nû çêbibe divê van tiştan li nûçeyê zêde bike. Wêne û vîdeoyan divê kontrol bike, wan biguherîne û yên nû li wan zêde bike.
- Heke ku derbarê mijarê de ji yekê zêdetir nûçe hatibin çêkirin, divê linkên wan di nava nûçeyan de bi cih bike.

- Pêşketin, daxuyanî û nêrînen li derveyî salona dadgehê çêdibin, divê li nûçeyê zêde bike an jî dosyayêke nû ji bo nûçeyê vebike.

Belgîyên ku divê di nûçeyan de hebin

- Îdianame, zabitnameya îfadedayînê, zabitnameya danişînê, daxuyanî û îfadeyên aliyên, nêrîna dozgerî ya derbarê esasê dosyayê de, biryarên dadgeha herîmî, biryarên îstînafê, Dadgeha Bilind, Dadgeha Destûrî û yên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û yên din.
- Ji bo demên pêş, pêşniyarên mijaran.
- Heke pêwîstî hebe divê nivîseke çavdêriyê bê nivîsanandin ku tê de nêrîna parêzeran a derbarê danişînê de, bertekên li dijî biryara hatiye dayîn, heke biryareke ku bibe sedema nîqaşê hatibe dayîn nêrînen akademisyenên hiqûqnas, dadkirinê berê yên heman biryar an jî biryarên weke wan dabîn bê nivîsandin. Yanî divê ev nivîs rewşa danişînê ragihîne.

Ji dûr ve şopandina dozan

Ne mimkun e ku nûçegihan hemû dadkirînan li cihê bûyerê bişopîne. Di rewşên wiha de nûçegihan dikare bi hiqûqnas, mafparêz, rojnameger, bersucî ku nehatiye girtin re biaxive û nûçeyê çêbibe.

Hin caran dikare twettên kes an jî saziyên biewle jî bixe nava nûçeyê. Em pêvajoya nûçenivîsinê ya bianetê ya derbarê dadkirina li Dadgeha Manhattanê de ya New Yorkê bi we re par ve dikin.

Nûçe:

- [Adam Klasfeld: Di Doza Sarrafi de me bi tweetan kêmasiya zanyariyan temam kir](#)
Pinar Tarcan- Navenda Nûçeyan a BIAYê -14ê Kanûna Pêşiyê ya 2017ê
- [Sarrafi: Min bertil dida Çaglayanî, Hakkan Atillaî bertil nexwest.](#)
Navenda Nûçeyan a BIAYê- 30ê Çiriya Paşiyê ya 2017

Ew doza ku li dijî “binpêkirina mueyideyên DYAYê li ser Îranê daniye” hatiye vekirin, di nûçegihaniya nişên nû de mîna keke balkêş e. Doz di nava civakê de weke “Doza Riza Sarrafi” tê zanîn. Bersûcê dozê Hakan Atilla, Midûrê Giştî yê berê yê Halkbankê, şahid jî karsaz Riza Sarrafi bû.

Di nava medyaya berbelav û ya alternatîf de yên ku nûçegihanên wan li Dadgeha Federal a Manhattanê nebûn, pêvajoya dozê bi rêya înternetê şopandin. bianetê doz bi rêya tweetên Adam Klasfeld, nûçegihanê Courtnewsê, Pete Brush nûçegihana Law260ê û Katie Zavaski, nûçegihana Daily Beastê şopand.

Pêvajoya şopandina vê dozê wiha bi rê ve çû:

- Danişin li gor saeta Tirkîyeyê di 17:00ê de dest pê kir û heta nîvê şevê berdewam kirin. Hesabên Twitterê yên nûçegihanên edliyeyan ên DYAYî hatin şopandin.
- Di dema şopandina dozê de navê Adam Klasfeldî derket pêş. Lê bi taybetî di dema jêpîrsîna çepûrast de, îfadeyên ku hatine dayîn bi rêya tweetan rojnamegerên din hatin erêkirin.
- Di nûçegihaniyê de piştrastkirina “çend çavkaniyên cuda heye” lê di vê mînakê de piştrastkirin “bi rêya çend hesabên Twitterê yên cuda” hate kirin.
- Him ji hêla naverokê him jî ji hêla şopandinê dibe ku bibe mijara tezan. Her weha ji hêla înteraktîvîyê jî di beşa xwe de mîna keke nû ye.
- Nûçegihanên edliyeyan, pêşketinên diqewimin kêlî bi kêlî bi rêya Twitterê radigihandin û ev pêşketin bi raya giştî re par ve kirin.
- Dema derbarê xalên navxweyî yên Tirkîyeyê û navên siyasîmedaran de pêwîstiya nûçegihanên pêvajoya dadkirinê bi zanyariyekê çêbiba, wan jî şopînerên xwe dipîrsî.
- Rojnameger û bikarhênerên medyaya civakî yên tirkîyeyî di heman kêliyê de bersiva nûçegihanê ku doz dişopand didan.
- Pêvajoya ku ji hêla polîtîk û hiqûqê ve surreal bû, rêbazêke din li rêbazên rojnamegeriya nişên nû zêde kir.

Nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê ya li cîhanê

“(Li welatên Rojava) ji bo nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê legal journalism tê gotin. Di rojnamegeriyê de qadeke gelekî girîng e. Divê ev rojnameger hemû jî xwedî formasyona hiqûqî bin û perwerdeyê baş dîtîbin. Li Amerîkayê kesekê/e ku ti zanyariya wî/ê ya hiqûqê nebe, nikare bibe legal journalist.”

Prof. Aslı Tunç, di pêşkêşa xwe ya Atolyeya Nûçegihaniya Pêvajoya Dadkirinê⁸ de behsa rewşa nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê ya li cîhanê dike. Balê dikişîne ser girîngiya zanyariya hiqûqî ya

8 Tunç, Aslı, Akademisyen Gözünden Yargı Haberciliği, 15ê Tebaxa 2018ê, http://bianet.org/bianet/medya/199996-akademisyen-gozunden-yargi-haberciligi?bia_source=rss, 13ê Sibata 2019ê hatiye bîdest xistin.

nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê.

“legal journalist him nûçegihaniya edliyeyan û ya bûyerên polîsiyê ye, lê li bal me tenê di maneya nûçegihaniya edliyeyan de ye. Li Amerîkayê weke kû hûn dizanin hemû tişt bi dozan bi pêş dikevin. Yanî legal journalist mirovekî/e wisa ye ku dozên mezin gelekî baş rave dibe û hemû pêvajoyên hiqûqê dizane.

“Lê li hin welatan divê parêzer an jî kesên beşên hiqûqê yên zanîngihan qedandibin nûçeyên dozan çêbikin. Ji bilî wê nabe ku bibin nûçe. Ev hemû ew mirov in ku li salonên dadgehan nûçeyan çêdikin, ji nûçegihanên pêvajoya dadkirinê re legal ango justice correspondent tê gotin.” muhabirlerine.”

Şeş xalên girîng

Rojnameger Saul Sugarman⁹ ji bo rojnamegerên pêvajoya dadkirinê pirtûka bi navê “Nûçegihaniya edliyeyan bi çi awayî tê kirin: Ji bo rojnamegeran 6 xalên girîng”¹⁰, amade kiriye. Ev pirtûk ji bo nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin û yên nû dest bi vî karî dikin gelekî bifêde ye.

Ferqeke mezin di navbera avahiyên dadgehan ên li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û yên li Tirkîyê hene. Divê em van li hêlekî bihêlin û vî pirtûkê bixwînin. Rojnameger li Edliyeya Çaglayanê, heke ku ji malbat û xizmên kesên tên dadkirin cih vala bimîne, dikarin bikevin salonên biçûk ên dadgehan û li wir rûnên.

Sugarman ne ji ber biçûkbûna salonên dadgehan gazindan dike, lê gazindan ji biçûkbûna navendên nûçeyan dike. Ev rastiyeke Tirkîyê ye jî. Di berdewamiyê de balê dikişîne ser rewşeke din ku ew jî li Tirkîyê heye:

“Bi berdewamiya biçûkbûna navendên nûçeyan re hin dezgehên medyayê bi hinceta ku dozên sansasyonel jî tê de kêm nûçeyan derbarê dozan/ dadkirinan de çêdikin tên rexnekirin. Dema ku nûçegihan berê xwe didin mijarên din an jî dest ji navenda nûçeyan berdidin, bi xwe re bîr/zanyariyên dezgehî yên derbarê çawaniya çêkirina nûçeyên edliyeyan de jî dibin.”

9 Nûçegihanê edliyeyan ê rojnameya Daily Journalê ye, rojname li San Franciscoyê derdikeve.

10 Sugarman, Saul, *How to cover a court trial: 6 tips for journalists*, Poynter, 2013.

Ji ber ku rê li ber nûçegihanên vedike me xwest em behsa rêbera Sugarmanî bikin. (Hin cihên ku bi

kêrî armanca me nayên, bi taybet ji bo DYAYê ne me cih neda wan beşan.)

Beriya çûna dadgehê

1. Bi her kesî re bibin heval:

Heke ku we li ser hiqûqê perwerde nedîtibe, wê zehmet be ku hûn tenê bi lêkolînkirina zabitnameyan hin dozan fam bikin. Li vir pêwistiya we bi parêzerekî/ê heye. Dibe parêzer neaxivin, nêrîna xwe bi we re par ve nekin, lê heke bizanibin hûn ê navên wan di nûçeyê di nenivîsinin, wê bikaribin alîkariya we bikin da ku hûn ji dosyaya dozê fam bike. Hûn dikarin ji bo nêrîna wan bigirin serî li dozger û dadweran bidin. Her du jî dikarin behsa pêvajoya heta wê demê bikin. Heke ku kes ji van neaxivin, hûn dikarin mînakeke ji zabitnameyê ji parêzerekî/ê din re bişînin û ew ji we re behsa dozê bike.

2. Ji her pêşketinê amade re bin:

Pêvajoya birêveçûna dozê ya ku ne li gorî bendewariyan pêk tê, yek ji wan pirsgirêkên herî mezin ên nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê ye. Dibe ku car caran şahid dereng bimînin. Axavtinên destpêkê dibe ku dirêj bin. Dibe ku doz were taloqkirin. Tekane

rêya baş a agahdariya li van tiştan ew e ku li dadgehê dozê bişopînin. Heke ku hûn nikaribin biçin, rêya çareseriyê ya herî baş ji kesekî/e ku li danişînê ye bipirsin. Ji bo zanyariyên zelal, ne tenê ji kesekî/e ji çend kesan bipirsin û zanyariyan werbigirin.

3. Lêkolîneke baş li ser rê û

rêbazên karkirinê bikin: Heke ku hûn di rê de bin, di be ku înterneta we qut bibe. Weke mînak, me dema doza Apple-Samsungê dişopand, gelek rojnameger û parêzer ji ber ku bi hev re ketin înternetê û barê wê giran bû, me nekarî înterneta belaş a dadgehê bi kar bianiya. Piştî îfadeydayîn qediyay, ji bo di tableta xwe de nûçeyê binivîsim, ez çûm kafeya herî nêzik. Şarja min li ber qedandinê bû. Ji ber pirsgirêkên înternetê û tableta min nedixebitî, beşek ji gotara min jê çû. Beriya dadkirinê li wan cihan binêrin ku piştî dadkirinê hûnê bikaribin biçin lê kar bikin an na. Her weha li înternetê binêrin bê ka hûnê bikaribin bi kar bin an na.

Beriya çûna dadgehê

Li gelek avahiyên edliyeyan odeya çapemeniyê heye ku rojnameger dikarin biçin li wir kar bikin. Lê binêrin bê ka hûnê karibin înterneta telefona xwe bi komputerê ve girêbidin an na.

4. Zû herin: Heke ku dozeke girîng be, herî kêmtir saetekê berî ku doz despê bike biçin. Dibe ku hewce bike hûn erebeyê park bikin û ji kontrola ewlehiyê hebe. Pirsgrêka herî mezin jî ew e ku peydakirina cihê rûniştinê ye. Dozên mezin dişibin şevên îne yên li salonên sînemayan. Mirov çakêt û dosyayên di destên xwe de belav dikin û ji bo pênc şeş hevalên xwe hewl didin cihan veqetînin. Di rewşeke wiha de nûçegihan dibe bi saetan li korîdorê yan jî bi kesên derengmayî re li paşê, li ser lingan bimîne.

5. Bi zimanê taybet ê hiqûqê nûçeyan nenivîsin: Gelek xwendekar pêwistî bi wan zanyariyan nabînin ku kêlî bi kêlî salona dadgehê çî bûye radigihînin. Gelek ji van diyalogên rûtîn in û ya girîng jî xwendekarekî/e ji rêzê guh nade têgehên qanûnî ango bala

wî/ê nakişîne. Girîng e ku mirov diyalogên bihêz û yên di hiş de bimîne hilbijêre. Ew diyalog, axaftin û daxuyanîyên ku bersiva “Çima”yê dide yên herî girîng in. Dozgerî çima daxwaz qebûl nekir? Dozdaran çima ji pêşveçûna danîşînê ne kêfxweş in? Nûçegihan bi piranî li axavtînen destpêkê û yên dawiyê guhdar dikin. Lewre mijarên sereke li vir tînen destnîşankirin. Lê dibe ku car caran ev tişt pirsgrêkan ji bo we çêbikin.

6. Bila bala we li ser kelûpelên elektronik be: Heke ku we li nik xwe komputer biribe, hemû şarja xwe ji bo notgirtina di dema danîşînê de xerc nekin. Li şûna vî tiştî lînûsekê bi xwe re bînin. Li gel parastina bataryayê, bi vî awayî hûn bi dengê klavyeyê kesên li dora xwe jî aciz nakin. Heman tişt ji bo telefonan jî rast e: Yan bi temamî bigirin, an jî li hêlekê bihêlin. Car caran edîtor ji nûçegihanên dixwazin ku pêşketinên di dema danîşînê de ji wan re ragihînin. Divê ev di asta herî kêmtir de çêbibe.

Şopandina danîşînan

Di nava şert û mercên asayî de, heke ku biryara nepenîtiyê nebe, dadgeh ji herkesî re vekirî ne. Herkesên ku dixwazin, dikarin danîşînan bişopînin.

Rêya herî hêsan a bidestxistina belgeyan, korîdorên edliyeyê û salonên danîşînan e. Zanyariyên derbarê dosyayan de yên weke gelo kîja belge ketiye dosyayê, rapora pisporan, rapora tenduristiyê, parazname û yên din hûn dikarin di dema danîşînan de bi dest bixin. Rojnameger dikare wan belgeyên ku di dema danîşînê de nehatine xwendin ji parêzerên aliyan, ji dozdar û kesên dozlêkirî bi dest bixin.

Li gorî Qanûna Muhakemeya Cezayan, ew dosyayên ku li ser wan biryara nepenîtiyê nebe, parêzerên ku ne aliyê dozê be jî dikare bibîne û lêkolînê li ser bike. Parêzerên ku di dozê de parastina aliyekî dikin, dikarin belgeyên dosyayê li ser Sîstema Agahdariyê ya Tora Dadê ya Netewî (UYAP) bibînin.

Rojnameger dikare rê û rêbazên bidestxistina belge û zanyariyan bibîne. Bisînor be jî dikarin alîkariyê ji berdestên dadgeh û dozgeran bibînin. Ji ber ku di vê tîkiliyê de ihtimala “manîpulasyonê” heye, divê rojnameger bi baldarî tevbigerin.

Zelalî

Zelalî yek ji himên bingeheî de dadkirina adilane ye. Biryara pêşniyar a Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê di 10ê Tîrmeha 2003yê de daye jî di vê çarçoveyê de ye. Biryar derbarê “dana nûçeyên derbarê peyketina cezayan de bi rêya medyayê” de ye.

“Divê bê dabînkirin ku rojnameger bikaribin bêyî cudabûnê û akredîtasyonê beşdarî danîşînê vekirî yên li dadgehên gelemperî û belavokên fermî yên gelemperî bibin. Heke ku li gorî Xala 6em a Girêbestê ya derbarê dadkirina adilane de pêwistiyekek çênebe, divê ji danîşînan neyên derxistin.”

Notên ji bo nûçegihanana

- **Avahiyên edliyeyê nas bike:** Divê nûçegihanê edliyeyan-yên pêvajoya dadkirinê beriya hert tiştî bizanibe ku avahiya edliyeyê nas bike. Bizanibe çi kar li ku tê kirin. Divê nevê bizanibe ku polîs gumanbaran li ku digirin, îfadeya wan li ku distînin, kîjan dozger bi kîjan mijarê re mijûl in, kîjan dadgeh li kîjan dozan dinêrin.
- **Kesên ku li edliyeyê kar dikin nas bike:** Naskirina dozger û dadweran tenê dibe ku ne bes be. Heke ku têkiliya nûçegihanî/ê bi berdestiyên dozger û dadweran û bi polîsên li qereqola edliyeyê re hebe, wê bikaribe bi hêsanî zanyariyên derbarê nûçeyan de bi dest bixe.
- **Ji her beşî parêzeran nas bike:** Ji ber wan serweriyên ku di Qanûna Mikameya Cezayan de hatiye diyarkirin, parêzer êdî dikarin bi hêsanî îfadeyan bi dest bixin. Bi rêya Sistema Agahdariyê ya Tora Dadê ya Netewî dikarin li dosyayan binêrin, zûtir xwe bigihînin îdianameyan. Têkiliyêke xurt a bi parêzerên wan dosyayên ku nûçegihan wan dişopîne, wê bihêle ku bi hêsanî xwe bigihîne belgeyan. Dema nûçegihan ji her beşî parêzeran nas bike wê ev tişt rê li ber bidestxistina nûçeyên cûrbecûr veke.
- **Pisporan nas bike:** Hiqûq di dawiya dawiyê de qadeke tenkîkî ye ku pisporî jê re pêwîste. Heke ku nûçegihan akademisyen û pisporên li qadê nas bike wê bi karibe bi hêsanî xalên girîng û yên sereke ên dosyayekê fam bike û zanyariyên rast ji bo civakî ragihîne.
- **Dosyayan bixwîne:** Dibe ku îdianame kurt bin jî lê dibe ku gelekî dirêj û tev li hev bin jî. Di rewşeke wiha de nûçegihanê ku neçare nûçeya xwe zû bi zû binivîse, divê di serî de li hejmara bersûcan, cezayên ku ji bo wan tê xwestin û tohmetan binêre. Piştî vî tiştî dikare li wê beşê binêre ku kurteya îdianameyê lê hatiye nivîsîn. Li vir dikare fam bike ku bê sedema tohmetkirinan çiyê. Xwendina hûr û kûr piştî ku nûçeya pêşiyê hate weşandin divê bê kirin. Piştî ku îdianame hat nivîsandin vê carê dikare tevahiya dosyayê bi dest bixe, tiştên di nava wê de hatine nivîsandin bixwîne, lêkolînê li ser belge û delîlan bike. Bi vî awayî nûçegihan dikare mijarên ku nûçegihanên din nedîtiye bibîne û wan bike nûçe.

“Divê dezgehên erkdar li gor derfetan û li ser daxwaza rojnamegeran dîrokên danişinan, ithamnameyan, îdianameyan û belgeyên din ên ji bo ragihandina nûçeyên yasayî dabin bikin. Bêyî ku cudabûnê bixin nav, divê destûr bidin hemû rojnamegeran ku bikaribin mîna keke ji biryarên dadgehên ji raya giştî re hatine aşkerekirin, bidest bixin. Divê rojnameger bikaribin van biryaran li nava gel belav bikin û wan ragihînin.”
(Biryara Konseya Ewropayê, Xala 15ê)

Lêkolîna li ser dosyeyan

Nûçegihanê/a pêvajoya dadkirinê divê bi awayekî hûr û kûr lêkolînê li ser wê dosyayê bike ku doza wê dişopîne.

Şopandina danişinan dibe ku nûçeyê bi rêkûpêktir bike lê heke ku lêkolîn li ser dosyeya dozê neyê kirin û nûçe bê nivîsandin, dibe ku ev nûçe kêm be yan jî xeletî tê de hebe.

Ji ber kar û barê zêde, car caran lêkolînkirina dosyayên fireh û mezin (Weke yên dozên Ergenekon, Balyoz, KCK û

Dinkî) ne hêsan e lê nûçegihanê pêvajoya dadkirinê bi rê u rêbazên ku pêş xistiye dikare van pirsgerêkan ji holê rake.

Heke ku ji serî de dozê nehatibe şopandin, dibe ku dosya ji dawiyê ber bi pêşiyê ve were xwendin. Bi vî awayî dikare pêvajoya dadkirina wê dosyayê baştir fam bike.

Di dema lêkolînkirina pêşiyê de girîng e ku nûçegihan li tebligatnameyan, navên aliyan, dîrokên tebligatkirinê û dîrokên karên din ên rê û rêbazî binêre.



- Heke ku ji serî de dozek nehatibe şopandin, dibe ku dosya ji dawiyê ber bi pêşiyê ve were xwendin. Bi vî awayî dikare pêvajoya dadkirina wê dosyayê baştir fam bike.
- Di dema lêkolînkirina pêşiyê de girîng e ku nûçegihan li tebligatnameyan, navên aliyên, dîrokên tebligatkirinan û dîrokên karên din ên rê û rêbazî binêre.
- Divê bi baldarî li raporên pisporan û îtirazên li hemberî van raporên bixwîne û wan bide ber hev. Divê lê binêre ku pispor kî ne, çi taybetmendiyên wan ên profesyonel hene û têkiliyên wan bi kê re hene.
- Bi parêzerê dozê re delîlan binirxînin, heke ku îdiaya delîlên kêmbin van îdiayan jî binirxînin û hewl bidin di çarçoveya xebatên rojnamegeriyê de van delîlan bi dest bixin.
- Bi lêkolîna li ser dosyayê re di heman demê de divê nûçegihan bi xizmên bersûc -hebe bi yê dozdar re- biaxive. Di vî pêvajoyê de divê li gorî pîvanên hurmeta li mafên şexsî tevbigere.

Divê bi baldarî li raporên pisporan û îtirazên li hemberî van raporên bixwîne û wan bide ber hev. Dibe ku gelek raporên pisporan ên jî nîqaşê re vekirî hebin.

Em ê li vir bûyereke ku di Tebaxa 2018ê de çûbûye weke mînak binivîsin. “Şirketa Apple-ê bi sedema ku ‘kelûpelên sexte’ difiroşe, nivîsa hişyariyê şandiyê şirketa bi navê BIMê ya xwedî rêzemarketan e. Li ser vî rewşê şirketa BIMê daxuyanîyek daye û

gotiye ‘dozgeriyê wezîfeya lêkolîne daye pisporekî û di encamê de hatiye zanîn ku kelûpelên navborî orijînal in.’”¹¹

Aliyên vî bûyerê di nava civakê de tîn naskirin, ji ber wê ye ku medyayê ev bûyer kiriyê nûçe. Dibe

¹¹ [gelek cureyên vî nûçeyê derkeve pêşberî me. Ji ber vî sedemê, divê raporên pisporan bi baldarî werin xwendin û lêkolîn li ser wan bê kirin.](http://www.diken.com.tr/bimden-urunler-sahte-diye-ihhtarname-cekten-apple-a-bilirkişi-‘Orijinal’ dedi, 31ê Tebaxa 2018ê, http://www.diken.com.tr/bimden-urunler-sahte-diye-ihhtarname-cekten-apple-a-bilirkişi-urunler-orijinal-vedi, 1ê Kanûna Pêşiyê ya 2018ê hatiye bidest xistin.</p>
</div>
<div data-bbox=)

Bi parêzerê dozê re delîlan binirxînin, heke ku îdiaya delîlên kêmbin van îdiayan jî binirxînin û hewl bidin di çarçoveya xebatên rojnamegeriyê de van delîlan bi dest bixin. Wê çaxê dê nîrxê nûçeya ku hatiye çêkirin jî bilindir bibe.

Yek jî divê rojnameger di dosyayan de li wan nivîsan binêre ku saziyan jî hev re nivîsandiye û şandiyê. Weke mînak, di dosyeya qetlîama 10ê Çiriya Pêşiyê de di nava nivîsên di navbera saziyan de derketiyê holê ku zanyariya çalakîya bombeyî la li hemberî Mitînga Aştiyê ya li Enqereyê dihate zanîn, lê digel vî jî ti tiştê nehatiye kirin. Heke ku nûçegihan yek bi yek van belgeyan bixwînin wê nîrxê nûçeyên wan bilindtir bibe.

Di nûçeyan de nivîsandina çavkaniyan

Li Tirkiyeyê beşek mezin ji nûçeyên pêvajoya dadkirinê edîtor bêyî ku çavkaniyan nîşan bidin, li navenda nûçeyan çêdikin. Heke ku neyê zanîn kê nûçe çêkiriyê û çavkanî neyê diyarkirin bawerîya li wê nûçeyê kêmîtir dibe û dihêle bi wî çavî li nûçeyê binêrin ku dixwaze manipulasyonê çêbike yan na.

Çavkaniyên nûçeyan

Ne diyar: %32

Ajans: %19

Servis: %11

Nûçegihan: %37,3

Lêkolîn li ser nûçeyên rojnameya Hurriyet, Sabah, Radikal, Cumhuriyet, Zaman û Yeni Şafakê yê di navbera salên 2004 û 2008ê de hatine kirin. Di encamê de xebata bi navê “Pêşkêşkirina Nûçeyên Derbarê Dadkirinê De Yê Di Çapemeniya Nivîskî Ya Tirkiyeyê” hatiye amadekirin –mixabin xebatên bi vî awayî her gav çênabin-. Ji bo vî xebatê, lêkolîna li ser 1215 nûçeyan hatiye kirin. Hatiye dîtin ku di 394 nûçeyan de çavkanî nehatine diyarkirin, yanî ji sedî 32,4ê nûçeyan

bêyî ku çavkanî di wan de bên diyarkirin hatine weşandin.¹²

Encameke vê xebatê ya ku cihê kêfxweşiyê ye heye. Ev jî ew e ku em dibînin hejmara nûçeyên rojnamegeriya lêkolîner ên bi navê nûçegihan hatine weşandin zêde dibin.



Divê neyê ji bîr kirin, nûçeyêke ku bi awayê çawalêhato hatiye çêkirin, gelek kêmasî tê de hebin, dema biçe ber destê edîtorî/ê dibe bi wan agahiyên nehatine pesendkirin “temam” bibe û bê weşandin.

12 Tunç, Aslı, Türkiye’de Yazılı Basının Yargıya İlişkin Haberleri Sunumu, Kalem, Seda (der.), Adalet Gözet: Yargı Sistemi Üzerine Bir İnceleme, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Hejmar 283, Kanûna Pêşiyê ya 2009ê.

Divê em vî tiştî ji bîr nekin, heke nûçeyek li gorî rê û rêbazên rojnamegeriyê bê çêkirin, dema çû ber destê edîtorî/ê wê bi hesanî nekaribe guhertinan tê de bike.

Ji ber rola krîtîk a medyayê, weke li her qadên din, divê di nûçegihaniya pêvajoya dadkirinê de jî bêyî dîtina belgeyan nûçe neyên çêkirin.

Rojnameger ger çavkaniya nûçeya wî aliyên dozê, dozger an jî parêzer be jî – bi taybet jî dibe ji ber vê rewşê- di mijara manîpulyasyonê de ji her gavê bêhtir baldar be.

Divê her agahiyên ku aliyên dozê dane, di dosyeya dozê de hebin, heke ku biryara weşartiyê li ser ne be nûçegihan dikare dosyayê bi dest bixîne.

Heke ku bêyî dîtina belgeyê zanyariyek hatibe bi dest xistin û divê bi lez û bez ev zanyarî di nûçeyê de bê belavkirin, divê wê



Nûçeyêke pêşî û paşîya wê diyar, çavkaniyên wê baş, jî bo dahatûyê dibe mohrek.

gavê nûçegihan dikare pêşniyarê li wî/ê kesî/ê bike ku di nava nûçeyê de navê wî/ê weke çavkanî binivîse. Çavkaniyên ku jê re hatibe gotin wê navê wî/ê di nûçeyê de bê nivîsandin, wê nikaribe bi hêsanî zanyariyên şaş/nerast bide. Nabe ku ji ber lez û beza nûçeyê, ji ber wê daxwazê ku nûçeyê beriya nûçegihanên din binivîse, zanyariyên ne piştrastkirî biweşîne.

“Ji bilî rojnameya Radîkalê ti rojnameyêke din hemû nivîsa Hrant Dînkî ne weşand ku Dînkî ji ber wê li gorî Xala 301ê dihate dadkirin. Di vê bûyerê de mirov dikare bibêje, pêşkêşiyêke wisa çêbûye ku hiştiye xwendekar gotinên Dînkî yên bûne sedema tohmetkirinê, perçe perçe û ji hev qut binirxînin.”¹³

Ji xwe ew nûçeyên ku li medyayê hatin belavkirin hiştiye nêrînek çêbibe û wê jî pêvajoya kuştina Hrant Dînkî hesantir kiriye. Doza kuştina Dînkî ji sala 2007ê û vir ve berdewam dike. Lê beşek ji medyayê vê dozê tune dihesibîne.¹⁴ Beşek ji rojnamegeran doza Dînkî dişopînin, bi parvekirinên kesên ji serî de dişopînin danîşin tê şopandin.

13 Tunç, Aslı, a.g.e.

14 <https://bianet.org/bianet/insan-haklari/204570-hrant-dink-cinayeti-davasinin-12-yillik-kronolojisi>

Kuştina Hrant Dinkî û doza wî

Rojnamegerê bi eslê xwe ermenî û jî Tirkîyeyê ye. rojnameya Agosê ava kiriye. 19 Kanûna Paşiyê ya 2007ê, derdora saet 15:00 li ber avahiya rojnameya Agosê ya li ser Kolana Halaskargaziya Şişliyê rastî êrîşeke çekdarî hatiye û hatiye kuştin. Wê gavê berpîrsê giştî yê weşanê bûye. Dînk cara pêşiyê ji ber wê nivîsa di rojnameya xwe de weşandiye bûye hedef ku nivîsê digot Sabiha Gökçen, keça manewî ya Mustafa Kemal, bi eslê xwe ermenî bûye. Paşê bi îdiaya ku heqaret li tirkîtiyê kiriye ji ber xala 301ê ya Qanûna Cezayan a Tirkan (TCK) hatiye dadkirin. Di vê demê de bêhtir gef lê hatine xwarin. Digel ku pişporan gotiye di nivîsa wî de heqaret nehatiye kirin, ceza lê hatiye birîn. Piştî gefên di dema dozê de û nûçeyên li rojnameya Agosê hatin weşandin, çapemeniyê ew weke hedef nîşan daye. Digel ku ji ber ewlehiya jiyana xwe metirsî pê re çêbûbe jî ji welêt veneqetiya ye. Beriya ku bê kuştin bi hefteyekê nivîsek bi ser navê Diltirsiya Kewan weşandibû. Di vê nivîsê de behsa pêvajoya hedefnîşandan û gefan kiribû.

Di roj û mehên piştî kuştina wî de derketiyê holê ku saziyên emniyet û istixbaratê gefên hatine xwarin û zanyariyên derbarê kesên Dînkî kuştine de dizanîbûn. Lê ji bo Dînkî biparêzin tiştê nekirine, zanyarî weşartine û çav ji kuştinê re girtine.

Şopandina hemû qonaxên bûyerê

Nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin, divê hemû qonaxên wê dozê bişopîne ku nûçeyên li ser wê di weşîne. (*bnr. pêvek 1*) Heke nûçegihan pêvajoya lepirsîn û dadkirinê ya kesekî/ê kiribe nûçe, -çiqas berdewam dike bila bike- divê ji civakê re ragihîne ku bê wî/ê kesî/ê beraet kiriye yan na, ceza xwariye yan na. Ev jî erka nûçegihan e.

Erk û berpirsiyariya nûçegihanên nûçeyên pêvajoya dadkirinê çêdikin e ku divê ji civakê re ragihîne bê doza ji Istinaf/Dadgeha Bilind re hatiye şandin hatiye qebûlkirin an na, birine Dadgeha Destûrî / Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê an na, di çi qonaxê de biryareke çawa hatiye standin, biryar pêk hatine yan na.

Kelûpela herî girîng a nûçegihanên pêvajoya dadkirinê ajanda ne ango lénûsk in. Ne tenê ji bo dîrokên danişinan binivîsin pêwîste. Her weha ji bo bizanibe di kîjan dozê de li bendî kîjan belgeyê ne û wê kengî bikeve dosyeyê. Raporên pisporan, îfadeyên şahidan û belgeyên din ên weke wan kengî ketine nava dosyeyê de. Ev tişt dihêle ku nûçeyên gelekî girîng bi dest bixe.

Pêvajoya dozên cezakirinan

- Lêpirsîn
- Pêketin
- Nêrina dawiyê ya li ser dozê
- Biryar
- Îtiraz
- Istinaf
- Temyîz
- Dadgeha Destûrî
- Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê

Zimanê nûçeyan û hiqûqê

Divê hemî nûçegihanên li ser pêvajoyên dadkirinê nûçeyan çêdikin bizanin ka “girtin” çi ye. Li gor Qanûna Mihakemeya Cezayan, di wan rewşên ku çêdibe bersûc bireve, delîlan tine bike an jî qismekê delîlan paqij bike dikare biryara girtinê bê dayin.

Dadger dikarin biryara girtinê bidin. Ev tedbîreka gelek girîng ya Mihakemeya Cezayan e. Dadger dikarin bi vê yekê heta şert misaîd bibin û biryara sûcdarbûn an nesûcdarbûnê biryarekê bê dayin azadiya kesên asteng bike.

Gelek caran di dadkirina kesên girtî û negirtî de bêdaletî tê kirin. Ji ber nûçeyên alîgir ên medyayê rewşeka welê çêdibe ku kesek li şûna ne-girtî bê dadkirin wek girtî tê dadkirin. Piştî dakirinê çêdibe eşkere bibe ku bersûc an gumanbar ne sûcdar e lê dîsa ew demê wî/wê bi girtîbûnê boriye.

Medya dikare bi nûçeyên wek “ew kesên ev sûc kirin çawa dikarin

Girtîbûn

Ji dema astengkirina azadiya bersûc an gumanbaran dest pê dike. Heta serbestbûn an jî mehkûmbûnê dewam dike.

li derve bigerin” fikreka neyînî çêbikin. Dema behsa “kesên li derve digerin” tê kirin, gelek caran behs li ser wan kesan e ku dadkirina wan nehatiye dest pê kirin. Çêkirina van nûçeyan binpêkirina nîşanên bêsûciyê ye.

Di gelek rewşan de dikare nûçegihan hêrs bibin. Lê dîsa jî çêkirina guvaşê, zererê dide balansên dadkirina adilane. Pêşniyar ew e ku divê nûçegihan û edîtor ferqa girtî û ne-girtîbûnê bi zelaî bizanin û li gor wê tev bigerin.

Du mînakên ji bo mijara heqiyê ya di nûçegihaniyê de

12ê Îlona 2016ê, hemşîreya bi navê Ayşegül Terzi, dema ji nobetê vedigeriya nobedarekê bi navê Abdullah Çakiroğlu, ji ber ku hemşîreyê şortek wergirtiye pehînek lê dabû. Hemşîreyê gilîya sûcî li nik dozgeriyê kiribû. Piştî kampanyayeka berfireh, 17ê Îlonê Çakiroglu hatibû desteserkirin û berdan. Piştî berdana wî kampanyaya li dijî Çakirogluyî berfirhtir bû û 19ê Îlonê dîsa hat desteserkirin û girtin. 26ê Çiriya Pêşiyê: Tehliye, 27ê wê mehê: Nerazîbûn, 28ê Mehê dîsa desteserkirin...

Çakiroglu bi sîcên "Anstengkirina bikaranîna azadiya ji bo fikir, bawerî û biryarê", "Sivik-kirina kesana an jî ji bo kîn û dijîniyê tehrîkkirina civakê" û "heqaret" hat dadkirin. Dozgerî/ê xwest ji 2 sal û 3 mehan heta 8 salan ceza lê bê birîn. Piştî dadkirinê ji bo Çakirogluyî 3 sal û 10 meh cezayê girtinê hat dayin. Parêzeran îtiraz kirin. Digel ku kiriyarên Çakirogluyî

medyakar hêrs kiriye jî diviya wan qaîdeyên bingehîn ên hiqûqê bînpê nekirin.

2017ê li Ataşehîra Stenbolê êrîşkarekî kulmek li jineka serî-nixamtî daye. Nivîskarê rojnameya Starê Ersoy Dede'yî bûyera "pehîne" û bûyera kulm-lê-danê danîne ber hev.

"Ji bo êrîşkarê ku li Ataşehîra Stenbolê kulmek li jineka sernixamtî dayî biryar hatiye dayin... Ji xwe ew jî hat paşdedan... Ev qas sal in ku bersûc im, min carekê jî nedîtiye welê wek bayê hatibim dadkirin... Doz, gilîya sîcdariyê, îdianame, doz û welhasil pêvajoyê didome lê wey mala teyê dozêk hima ji nişkê ve temam bû. Ceza? Ceza nîne... Lawê min careka dî neke! Temam. Nexwe ji bo li sîstema dadkirinê bi lez bixebite divê jineka nixamtî bi pehîn û kulman bê bingavtin..."¹⁵

15 Dede, Ersoy, Şortlu kîza tekme ve başörtülü kadına yumruk, 3yê Çiriya Paşiyê ya 2014ê, <https://www.star.com.tr/yazar/sortlu-kiza-tekme-ve-basortulu-kadina-yumruk-yazi-1271042>, 13ê Sibata 2019ê hatiye tikandin.

Pêngavên lêpîrsîn û pêketinê

Du beşên mihakemeya cezayî hene: Peyketin û lê pîrsîn. Di nûçeyan de em dibînin ku tê gotin "bi doza ku dihat dadkirin, X hatiye girtin." Lê heke em ji nêzîk ve li bûyerê

binêrin em ê bibînin ku piraniya caran, doz nehatiye vekirin. Lêpîrsîn didome û xeletiyeka teknîkî hatiye kirin.

Rêbaza pêketin, lêpîrsîn, desteserkirin, îfade-standin û jêpîrsînê

Pêketin, peyketin: Ew dem e ku ji qebûlkirina îdianameyê dest pê dibe heta eşkerekirina biryarê didome.

Lêpîrsîn: Ew pêvajoyê ku ji dema aliyên rayedar ji sîcekê dikevin gumanê dest pê dibe heta amadekirina îdianameyê didome.

Desteser-kirin: Ew pêvajoyê demkî ye ku li gor qanûnan azadiya kesên hatin girtin bi awayekê saxlem û ewle tê astengkirin ku dozger ji bo wan biryarê bide an serbest bibe.

Standina îfadeyê: Ew dem e ku aliyên ewlehiyê an jî dozgerên komarê li ser sîcan guhdariya bersûcan dikin.

Jêpîrsîn: Ew pêvajoyê ku li ser sîcekê dadgeh an jî dadger guhdariya gumanbar an jî bersûcên sîcekê dikin.

Girtin: Ew kiriyar e ku kesên delîl, guman û daneyên xurt hene ku metirsiyê li ser civakê, kesana û rêk-û-pêkiya civakê bikin, ji beriya ku bîne desteserkirin an jî kontrolkirin bi awayekê demkî azadiya fiilî tê astengkirin.

Bersûc: Ew kes in ku ji dema pêketinê heta dayina hikimî, di bin gumana sîcdariyê de ne.

Gumanbar: Ew kes in ku dema lêpîrsînê de, di bin gumana sîcdariyê de ne.

Di pêvajoya dadkirinê de, wek edetî pêşiyê dozger lêpîrsînê didin dest pê kirin. Paşê ji bo îfade-standinê bangî hin kesan dike an jî biryara desteserkirina wan dide. Hingê jî îfadeya wan distîne. (Vê paşiyê piraniya caran kes têne desteserkirin)

Heke di dema lêpîrsînê de dozger biryarê bide ku ew kes divê bê girtin, dozger wî/wê kesê/î ji bo dadgeriya sûlûh û cezayî dişîne.

Medya piraniya caran vê pêngavê bi vî awayî dike nûçe: “Kesê/a ku dihat dadkirin bi şertên kontrola edlî hatiye berdan.”

Lê belê hingê hê dadkirinê dest pê nekiriye. Dadger dikare biryarê bide ku ne hewce ye ew kes bê dadkirin. Ji bo bi kontrola edlî kesek bê berdan dadger li daxwazên dozgeran dinêre, li gor daxwazên wan û bûyerê biryarekê dide.

Gumanbar û bersûc tê tevlihevkirin

Dozgerê nikare biryarê bide ku kesê bi navê X bersûcek e. Di wê dema dozger lêpîrsînê dike de, X bi tene gumanbar e. Da ku X bibe bersûc divê îdianame bê amadekirin û qebûlkirin. Heta doz diqede X dê bibe bersûc.

Zimanê nûçeyan

Xebatek hatiye kirin. Lêkolînek li ser heft rojnameyên neteweyî yê 2004-2008ê de derketin hatiye kirin. Di Pêşkêşiya li ser *Nûçeyên Li Medyaya Nivîskî yê Li Ser Pêvajoya Dadkirinê* de, diyar bûye ku her ku diçe zimanê medyaya Tirkîyeyê xera dibê.¹⁶

Eşkere ye ku ji sala 2004ê ve zimanê nûçeyan, ji bo pêvajoyên dadkirinê her ku diçe xerabtir dibê. Di lêkolînê de nûçeyeka rojnameya Hurriyetê heye. Di nûçeyê de hatiye diyarkirin ku manekê digel du mêran çûye odeya xwe. Di nûçeyê de gotinên karmendên ewlehiyê wek rast bin hatiye qebûlkirin. Bi awayekê welê hatiye nivîsîn ku dikare bandorê li pêvajoya dadkirinê bike.

Dîmên manekê ji bo medyayê hatiye şandin. Doz hatiye vekirin. Di lêkolînê de hatiye eşkerekirin ku bi nêrîna exlaqperest hatiye nivîsîn û “kiryara(şandina dîmenan) rast” hatiye nîşandan.

Di sala 2018ê de bûyerên Ednan Xoce(Adnan Oktar), kuştina Şule Çetê, hevberdana Sinem Gedîkê û Mustafa Cecelîyî qewimîn. Medyayê ji bo van bûyerên zimanekê hişk û kirêt bi kar hîna.

16 Tunç, Asli, a.g.e.



Doz: Ew pêvajo ye ku ji bo armanc û biryarekê daxwaz ji organekê dadkirinê tê kirin. Piştî vê yeke ew organ li ser mijara daxwaz hatiye kirin çareseriyekê dibine biryarekê dide.

Rûniştin: Ew kiriyarên in ku ji bo dadkirinê di wê roja dadgehê biryar dayî de tene kirin. Divê gotina “paşdedana rûniştinê” neye bikaranîn. Ji bo nimûne li şûna bê gotin “rûniştin ji bo 5ê Adarê hat paşdedan” divê bê gotin “rûniştin 5ê Adarê ye.”

Biryar: Ew biryara piştî dadkirinê ye.

Nûçeyên li ser operasyonan

Prof. Dr. Aslı Tunç, li ser operasyona li Adnan Oktarî, 17ê Tîrmeha 2018ê hatî kirin dibêje “seksîstî, mêtîngerîya dînî, tabloyên laşe tazî, qesir, tiştên polîsiye, tevgerên ji bo firarê, her tişt bi hev re”

“Sansasyonel-kirin dikeve ber çavê mirovan. Welê tê diyarkirin ku wekî nûçegihan bi xwe di wê deme de li wê dere bûye. Adnan Oktar direve. Polîs wî digire. Ji 15 nûçeyan çavkaniya 6 nûçeyan nîne.”¹⁷

17 Tunç, Aslı, Akademisyen Gözünden Yargı Haberciliği, 15ê Tebaxa 2018ê, http://bianet.org/bianet/medya/199996-akademisyen-gozunden-yargi-haberciligi?bia_source=rss, 13ê Sibata 2019ê hatiye bidest xistin.

Prof. Dr. Tunçê ji bo xebata xwe pirsîye: “Te nûçe ji kê bihîst? Gelo tu li wê dere bûyî? Kê nivîsî, nûçeya navenda nûçeyan e an ajansan weşandiye, gelo nûçeyeka taybet e?”

Gökçer Tahincioğlu nûçegihanê pêvajoyên dadkirinê ye. Rexneyên wî yên li ser operasyona Adnan Oktarî ji bo nûçegihanê wek rêberê ye:

“Heke biryara tedbîrê ji bo mal û milken Adnan Oktarî hatibe dayin. Ji bo kîjan mal û milken

wî biryar hatiye dayin divê ew bê eşkerekirin. Ez bi hişmendîya kevin dixebitim. Divê bizanim ku bikarim li dosyeyê binerim.

“Malê Adnan Oktarî hatiye desteserkirin. Lê ez nizanîm çi malen wî hene. Bi tene ez dizanim, mehaneya wî 3.500 lîre ne. Wê jî ji jêpîrsîna dadgeran dizanim. Gelo nûçegihanek heye ku çûbe Dadgeha Karî? Na. Gelo kesek heye ku wî/wê hakimî/ê binase. Hakimiya li dadgehê welê dike ku hûn bikarin van teqîb bikin.”¹⁸

18 Tahincioğlu, Gökçer, Gazeteci Gözünden Yargı Haberciliği, 16ê Tebaxa 2018ê, <http://bianet.org/bianet/medya/200032-gazeteci-gozunden-yargi-haberciligi>, 13ê Sibata 2019ê hatiye bidest xistin.

Maf û berpirsiyarî

Komîteya Wezîran ya Yekîtiya Ewropayê ji bo pêketina cezayan gelek biryaran dide û bi rêya medyayê, civakê jê agehdar dike.¹⁹

Ev kar ji ber wê yekê tê kirin ku li gor xala 10. a Hevpeyman Mafên Mirovan a Ewropayê mafê civakê heye li ser bûyerên civakê eleqedar dike agehdar bibe.¹⁷

Divê em bînin bîra xwe ku Tirkiyeyê jî hevpeyman Mafên Mirovan a Yekîtiya Ewropayê îmze kiriye. Li gor xala 6/2 û 8. mafê parastina nîşanên bêsuçiyê û dadkirineka adilane ya kesan heye.²⁰ “Her kesên ku bi sûcekê tene sûcdarkirin, heta ku sûcdariya wan tê piştrastkirin, ew bêsuç in.” (Hevpeyman:6/2)

19 Avrupa Konseyi, “Ceza Yargılamalarının Yayınlanmasına İlişkin Hukuki Kuralların Düzenlenmesi” ile İlgili Tavsiye Kararı No. R, 2003, <http://www.hsk.gov.tr/Eklentiler/Dosyalar/ef6bf8e9-52db-48c0-b533-281bf50f1fa3.pdf>, 13ê Sibata 2019ê hat bidestxistin.

20 Avrupa Konseyi, Avrupa İnsan Hakları Sözleşmesi, 2010, https://www.echr.coe.int/Documents/Convention_TUR.pdf 14ê Çiriya Paşiyê 2018ê hat bidest xistin.

Mafê rêz û hirmeta li jiyana taybet û jiyana malbatî

Dema ku agahiyên taybet ên li ser bersûc û gumanbarên dozeka didome tê kirin divê li gor xala 8. a Hevpeyman Mafên Mirovan a Yekîtiya Ewropayê jiyana taybet bê parastin û rêz li jiyana malbatî bê girtin.



Mafê her kesan heye ku rêz li jiyana wan a taybet, jiyana malbatî, warê wan û peywendiyên wan ên nivîskî bê girtin.

Divê dema rojnameger li ser gumanbar, bersûc, girtî, qurbanî û şahidan nûçeyan çêdikin hessas bin. Divê bala xwe bidin ser wê yekê ku bi nûçeyê zerer negihe ti kesan.

Divê rojnameger bala xwe bidinê ka ew agahiyên kesane metirsîyekê çêdike an na. (Xala li ser peyketina cezayan a pêşniyarkirî ya 8. a Komîteya Wezîran ya Yekîtiya Ewropayê)

Mafê Serastkirinê û bersivdanê

“Dema peyketina sûcan de heke kes di nûçeyan de hatibin reşkirin (bi awayekê xerab hatibe nîşandan) mafê wan heye ku bersivê bidin an jî agahiyê bidin rastkirin. Mafê wan heye ku bûltenên ji bo çapemeniyê yên Emniyet û berpirsiyarîyên edlî jî serast bikin. (Xala li ser peyketina cezayan a pêşniyarkirî ya 9. a Komîteya Wezîran ya Yekîtiya Ewropayê)

Nîşanên bêsuçiyê

“Heta biryara sûcdariya kesan neyê dayin ew nikare wek sûcdar bêne hesibandin.” (Qanûna Bingehîn 38/4)

“Her kesên ku bi sûcekê tene sûcdarkirin, heta ku sûcdariya wan tê piştrastkirin, ew bêsuç in.” (Hevpeyman Yekîtiya Ewropayê, Xala 6.)

Di nûçeyan de nîşanên bêşûciyê gelek caran tê binpêkirin

Sala 2017ê dema operasyona ByLockê hatî kirin li ser I.Tyî nûçeyên bi vî awayî hatin nivîsîn: Ji bo FETOyê tevna peywendiyên wî daniye. Tyê ByLockçî²¹ têkilî bi anarşîstên Geziyê û PKKyê ve hebûye.”

Piştî van nûçeyan sê mehan I.T. li girtîgehê ma. Paşê diyar bû ku di lîsteyan de xeletî hatiye kirin û I.T. serbest bû.

Di vî pêvajoyê de li ser I.Tyî ji ber ku çinaetek neyînî hat çêkirin karê wî ji destê wî çû, mirovên wî jê sar bû, ji ber ku biryar dê bê temyizkirinê jê derketina derveyî Tirkiyeyê jê re qedexe ye.

Dema I.T. desteserkirî bû, diyar dibe ku nûçegihanên hay ji mafê wî yê parastina nîşanên bêgunehiyê nebûye. Wan lêkolîn li ser çavkaniyê nûçeyan nekiriye.

Îhtimaleka mezin çavkaniya nûçegihanên bi tenê polîs bûne. Lê heke wan lê binêriya dê di

dosyeya wî de bidîtiya ku “ji ber ku ByLock bar kiriyê” wek endamê FETOyê hatiye qebûl kirin.

Ji ber ku binpêkirina mafê nîşanên bêşûciyê herweha mafê dadkirina adilane jî binpê dike, mafên bingehîn ên mirovan bi vî awayî tê binpêkirin.

Divê nûçegihanên pêvajoyên dadkirinê bi awayekê gelek ciddî li çavkaniyên xwe binêre. Heta ku ew mecbûr in vî yekê bikin. Ji beriya dîtina belgeyên lêpîrsînê, bi tenê bi agahiyên hatin bihîstin dema ku nûçe tene nivîsîn dikare rewşeka welê çêbike ku êdî neyê telafî kirin.

Nîşandana nav û dîmenan

- Navê gumanbaran divê neyê nivîsîn. Navê bersûcan jî bi awayekê girtî tê nivîsîn. Navê wan kesên ji aliyê civakê ve tene nasîn; sîyasetmedar, nivîskar, stranbêj, listikvan di her rewşê de bi awayekê eşkere tê nivîsîn.
- Divê nav û dîmenên zarokên gumanbar an jî bersûc di nûçeyan de neyên nîşandan û nivîsîn.
- Di wan rewşan de ku nûçe dikare tesîrê li kesayetiya zarokan bike, divê destûr ji malbata wan bê standin.²²
- Divê nav û dîmenên jinên ku êrîşa zayendî lê hatiye kirin bêyî destûra wan neyê nivîsîn an jî nîşandan.²³
- bianet, nav û dîmenên wan kesên ji 18 saliyê biçûktir û jinên tûndkarî lê hatî kirin an jî êrîşeka zayendî lê hatî kirin nanivîse, nîşan nade.
- Ji ber nûçeyên berê yê bianetê, gelek daxwaz ji wan kesên navê wan di nûçeyan de hatî nivîsîn heye ku navê wan bê rakirin. Heta bi mijarê ve ne têkildar be bianet kesan û dîmenên wan bi eşkereyî nawaşîne.

21 Di nûçeyê de nav bi awayekê eşkere hatiye nivîsîn. n.n.

22 Türkiye Gazeteciler Cemiyeti, Türkiye Gazetecilik Hak ve Sorumluluk Bildirgesi, <https://www.tgc.org.tr/bildirgeler/turkiye-gazetecilik-hak-ve-sorumluluk-bildirgesi.html>, 13 Sibata 2019ê, hat bi dest xistin.

23 İrvan, Süleyman, Gazetecilik Etiği: “İsimlerin Kodlanması ve Fotoğrafların Buzlanması Kılavuzu” 5ê İlonaya 2017ê, <https://suleymanirvan.blogspot.com/2017/09/gazetecilik-etigi-isimlerin-kodlanması.html>, 13 Şubat 2019’da hat bi dest xistin.

Yên 18 salî û ji wî emrî biçûktir

Ji bo wan kesên ji 18 saliyê biçûktir hem li gor TCKyê(Qanûna Cezayan a Tirkan) hem jî li gor qanûnên navneteweyî têgeha “zarokên ketî di nav sûcan de (SSÇ)” tê bikarînan.

Zarok bi vî awayî, bi awayekê pasîv têne nîşandan. Tê eşkerekirin ku ew wek mirovên kamil ji kiriyarên xwe ne berpirs in.

Divê di nûçeyan de bi awayekê eşkere têgeha “zarokên ketî di nav sûcan de(SSÇ)” bê nivîsîn. Bi ti awayî dîmen û navê zarokên şahid, bersûc û gumanbar di nûçeyan de nayê nîşandan. Mixabin mafên bingehîn yên wan kesên ji 18 saliyê biçûktir têne binpêkirin. Du nimûneyên herî berçav yên vê paşiyê Berkin Elvan û Ogün Samast in. Bi germiya rojevê mafên wan ên bingehîn hem ji aliyê etîkê ve hem jî ji aliyê qanûnî ve hatin binpêkirin.

Şandina qayûman

Piştî jin û mêr bi pevçûnan ji hev cida dibin yek ji mijarên sereke mijara debarîyê(nefeqe) ye. Ji-hev-cidabûna Sinem Gedik û Mustafa Ceceliyî di sala 2018ê de di rojevê de cih girt.

Çapemeniya magazinê mijar hinek dî şarand. Piştî komên femînîst li Gedikê bûn xwedî wan karînan we bikin ku Gedik hindik zerere bibîne. Di rewşên bi vî awayî de, wek edetî qeyûm têne şandin. Ev yek tiştêka ji rêzê ye. Lê di mijara Gedikê û Ceceliyî de wek cara yekê çêbûbe hatibû nîşandan.



Medyatîkbûna dê û bavên medyatîk wê rêyê nade ku zarok jî di medyayê de cih bigirin.

Dema berjewendiyên zarokan û dê-bavê wan li hev nekin li gor qanûna TMK 426/b.2.ê qeyûmek tê erkdarkirin.²⁴

Di nûçeyan de hatibû nîşandan ku ji ber Gedikê yarek hebû(yareka jin) û ev yek ne exlaqî bû, qeyûm hatiye erkdarkirin.

Halbûkî divîya nûçegihanên lê binêrin ka ev kiriyar ji rêzê ye an na û paşê nûçe binivîsiya.

Bi hevsa stajeran

Piştî me bi sedan rûperên dosyeya dozan xwendin, me agahiyên bingehîn ên hiqûqê jî zanî, gelo dilê me dê rihet bibe? Na!

Nûçegihaniya li ser pêvajoyên dadkirinê, belkî beşê herî zêde xebat divê ye rojnamegeriyê be. Nûçegihaneka/ê pêvajoya dadkirinê divê Qanûna Bingehîn û Qanûna Cezayan a Tirkan dane nik xwe.

Divê li civînên meclîsê binêre. Reşbelekên qanûnan teqîb bike. Divê serwextê zimanê hiqûqê be. Ji bilî van tiştan divê wan hay jê hebe ka ji ber çî qanûneka nû dê bê çêkirin.

²⁴ Ji bo agahiyên berfireh, bnr: Yücel, Özge, Çocuğun Kayımı Tarafından Temsili, Turhan Yay., Ankara, Nisan 2011.

Divê ew sîstematîk li Rojnameya Fermî binêre. Êdî Rojnameya Fermî dîjîtal e şopandina wê hêsanîtir e.

Divê em li kitêbên hin pîşeyan binêrin ku em li derveyî wê pîşeyê ne.

Rojnameger, Gökçer Tahincioğlu: Tu nezanî telefon neke

Li ser mijarê Gökçer Tahincioğluyî gotiye:

“Gelo dema me dest pê kirî ku em kar bikin me gelek rast dihat kirin, na. Di serî de ji bo pîşeyê em ne amade bûn. Hê jî ev kêşe heye. Di dema bûyera îşkenceya li ciwanên ji Manîsayê de de ez nûçegihan bûm. Min telefonî parêzerê dozê, Sabri Ergülî kiribû da ku pirsan jê bikim. Min nekaribû pirsan jê bikim. Wî gotibû ‘tu nezanî telefon neke.’ Ev ji bo min bû dersek. Hingê bi wê şermê min fikirî ka divê çi bikim. Min beşa hiqûqê xwendibû. Min got divê têgehan ji nû ve bizanim û dadgehê binasim.

Ne giring e we hiqûq xwendibe. Bi hewesa stajerekê dest biavêjin mijarê bes e..”²⁵

25 Tahincioğlu, Gökçer, Gazeteci Gözünden Yargı Haberciliği, 16ê Tebaxa 2018ê, <http://bianet.org/bianet/medya/200032-gazeteci-gozunden-yargi-haberciligi>, 13ê Sibata 2019ê hat bidest xistin.

Akademîsyenên Aşîxwaz

Da ku em bibînin ka karê rojnamegeran çi qasê zehmet û teknîkî ye mînakên baş dozên “Akademîsyenên Aşîxwaz” in. Piştî pêjoya çareseriyê bi dawî bû. Li Başûrê Rojhilatî xendek hatin kolandin û li warên jiyane operasyon hatin kirin. Piştî vê yeke akademîsyenan nivîsek îmze kir. Bi îmzekirina wê nivîsê ew ji karen xwe hatin avêtin paşê yek bi yek li ser akademîsyenan doz hatin vekirin.

10ê Çileyê Paşîn a 2016ê, “Însiyatîfa Akademîsyenên Aştîxwaz” (BAK) danezana “Em ê nebin şîrkên vî sûcî” îmze kiribûn. Danezan bi îmzeya 1128 akademîsyenan hatibû weşandin. Paşê jimara beşdarên bûbû 2212. Dozgerê bi navê İsmet Bozkurt bi xala 7/2yê ya Qanûna Dij-Terorê(TMK) bi sûcê “propagandmeha rêxistinê” doz li akademîsyenan vekiribû Li gor agahiyên hefta 10ê Nisana 2019ê hatin bidestxistin: Ji 5ê Kanûna Pêşiyê ya 2017ê pê ve, 600 akademîsyen hatine dadkirin. Her yek ji 130 akademîsyenan salek û sê meh; heryek ji 16 akademîsyenan salek, 10 meh û 15 roj; heryek ji 8 akademîsyenan salek û şeş meh; heryek ji du akademîsyenan salek, 6 meh û 22 roj û akademîsyenê 3 sal cezayê girtinê standiye. Ji bo 182 akademîsyenan biryar hatiye dayin, hemîyan cezayê girtinê standiye.

Biryara mehkûmbûnê ya 32 kesan nehatiye paşdedan. Ji 182 kesan 26 kesan ji 2 salan zêdetir cezayê girtinê standiye(CMK, Xala 286.), 6 kesan nexwestiye biryara mehkûmbûna wan bê paşdedan. Piştî îtirazê, DAdgeha İstinafê cezayê ji bo Prof. Dr. Füsün Üstelê hatî dayin pesend kiriye.

Navê akademîsyenên ku cezayê wan nehatiye paşdedan ev in: Ayşe Erzan, Özdemir Aktan, Nesrin Sungur Çakmak, Füsün Üstel, Büşra Ersanlı, Lütifiye Bozdağ, Şebnem Korur

Fincancı, Özgür Müftüoğlu, Yonca Demir, Gençay Gürsoy, M.A., Alper Akyüz, Ahmet Bekmen, Nihan Aksakallı, Hülya Kirmanoğlu, İsmet Akça, Haydar Durak, İlkay Özkuralpli, Öznur Yaşar Diner, Remzi Orkun Güner, Esra Kaliber, Eda Aslı Şeran, Aysuda Kölemen, İlkay Yılmaz, Zeynep Tül Süalp, L.N., S.A., Gevher Gökçe, Çare Olgun Çalışkan, Nevin Zeynep Yelçe, Ali Kerem Saysel, Koray Çalışkan.

Dadgeha Cezayên Giran a 36. cezayê wan kesên HAGB nexwestinê kêm kir û 2 salan bi şertê kontrolkirinê cezayê akademîsyenan bi paş de da. Dadgeha Cezayên Giran a 32. Ji bo wan kesan ceza kêm kir lê dema cezadanê bi paş de neda. Dadgeha Cezayên Giran a 37. Hem ceza kêm nekir hem jî bi paş de neda. Pirsra HAGByê ji sê akademîsyenan nehat kirin. Yek ji akademîsyenên HAGB jê nehatî pirsin salek û 6 meh, yekî/ê salek û 3 meh, yekî/ê 2 sal û 3 meh cezayê girtinê standiye. Akademîsyenên ku ji 2 salan zêdetir ceza xwariye û dema cezayî nehatiye paşdedan dêli benda biryara îstinafê bimînin. İstinafê dê biryarê pesend bike an jî betal bike. Heke pesend bike akademîsyenê dê biçin girtîgehan. 10 Adara 2016ê Alk. Doç. Dr. Esra Mungan, Alk. Doç. Dr. Muzaffer Kaya û Doç. Dr. Kıvanç Ersoy (15ê Adara 2016ê) û Yrd. Doç. Dr. Meral Camcı (31ê Adara 2016ê) di kongreyeka rojnamegeran de danezan xwend. Ew bi Qanûna Têkoşina Li Dijî Terorê(TMK 7/2) bi sûcê “propagandaya ji bo teröre hatin girtin. 22yê Nisana 2016ê serbest bûn. Bi daxwaza dozgerî Wezareta Dadê destur da ku akademîsyen bi sûcê “Sivikkirina(şîkênandina qedrê) Gelê tirk, Dewleta Komara Tirkiyeyê, sazî û organên wê - TCK 301.” bene dadkirin. Dadkirina wan didome.

Bitîkîne – Dozên Akademîsyenên Aştîxwaz

Doza Ozgur Gundemê

Rojnameya Ozgur Gundemê bi Biryarnameya Di Hikmê Qanûnan de hat girtin. 3yê Adara 2016ê kampanyaya Nobedariya Berpirsiyariya Weşanê dest pê kir. 7ê Tebaxa 2016ê kampanya bi dawî bû. 49 kes beşdarî kampanyaya nobedariyê bûn. Li ser 49 kesan lêpirsîn hat vekirin. Li ser 38 dosyeyan doz hatin vekirin. Ji bo 11 dosyeyan biryara “ne hewceyî pêçûnê ye” hatiye dayin. 38 nobedarên berpirsiyariya weşanê bi xala 7/2(propagandaya ji bo teröre) û xala 6/2(weşandin an jî belavkirina daxuyanîyên rêxistinên terorî) yê Qanûna Têkoşina Li Dijî Terorê hatin dadkirin. Ji bo Îhsan Eliaçık, Melda Onur, Sabahat Tuncel, Ahmet Abakay, Eşber Yağmurdereli, Hasip Kaplan, Işın Eliçin, Kemal Can, Mustafa Sönmez, Uğur Karadaş, Nurcan Baysal 11 caran biryara ne hewceyî pêçûnê ye hat dayin. Li ser 38 kesan doz hat vekirin. Dema ji bo dadkirinê ji bo doza Deniz Türkali tamam bûye. Ji bo 24 nobedaran; Şanar Yurdatapan, İbrahim Bodur, Cengiz Baysoy, Hüseyin Tahmaz, Çilem Küçükkeleş, Nadire Mater, Yıldırım Türker, Hasan Cemal, Faruk Balıkcı, Dicle Anter, Derya Okatan, Kumru Başer, Ayşe Batumlu, Jülide Kural, Murat Uyrkulak, Murat Çelikkan, Beyza Üstün, Nevin Erdemir, Hakki Boltan, Hasan Hayri Şanlı, Tuğrul Eryılmaz, Hüseyin Aykol, Ayşe Düzkan, Ragıp Duran, Öncü Akgül, İhsan Çaralan, Ertuğrul Mavioğlu, Celal Başlangıç, Celaltin Can, Fehim Işık û Faruk Eren jî tê de doza 31 kesan didome. Hasan Hayri Şanlı, Nevin Erdemir, Hüseyin Tahmaz û Hakki Boltan beraet kirine. 27 kesan li ser hev 67 hezar TL û 293 meh 15 roj cezayê girtinê stand. Ji

bilî cezayê Ayşe Duzkan û Murat Çelikkanî cezayê nobedarên di hat paşdedan an jî bi pereyan hatin guhertin. Çelikkan, 14ê Tebaxa 2017ê çû Girtîgeha Kırklareliyê, 14ê Çiriya Pêşiyê ya 2017 çû girtîgeha vekirî. 21 Çiriya Pêşiyê ya 2017ê tehliye kiriye. Dadgeha İstinafê salek û şeş meh cezayê girtinê daye Ayşe Duzkanê û 29ê Kanûna Paşiyê ya 2019ê ji bo Girtîgeha Jinan ya Bakirkoyê hatiye şandin. Erol Önderoğlu, Ahmet Nesin û Şebnem Korur Fincancı 20ê Hezîrana 2016ê hatin girtin, piştî 10 rojan serbest bûn. Doza li ser; Erol Önderoğlu, Ahmet Nesin, Şebnem Korur Fincancı, Can Dündar, Said Sefa, Veysi Altayî didome. Berpirsê weşanê İnan Kızılkaya di her 38 dosyeyan de bersûc e. Dosyeyên li ser Kızılkayayî li doza bingehîn a Ozgur Gundemê hat zêdekirin Dadkirin li Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê ya 23, pêkanî. Ji ber nivîsên Ömer Ağın, İmam Canpolat, Dilşa Kocakaya û İlham Bakırî her yek ji wan 15 meh cezayê girtinê standiye. Nivîskarên; İmam Canpolat û İlham Bakırî salek û 3 meh cezayê girtinê standin. Cezayê Bakırî hat paşdedan lê yê Canpolatî nehat paşdedan. Nivîskarên rojnameyê; Mehmet Ali Çelebi û Hüseyin Bektaşî salek û 6 meh cezayê girtinê standine. Cezayê wan nehat paşdedan. Bi doza bingehîn ya Ozgur Gundemê endamên lijneya şewirmend; Necmiye Alpay, Aslı Erdoğan, Ragıp Zarakolu, Filiz Koçali, Eren Keskin, midûrê weşanê Zana Kaya, İnan Kızılkaya, Kemal Sancılı û Bilge Oykut têne dadkirin. Sancılı heta 10ê Nîsana 2019ê di girtîgehê de ma. Herrweha berpirsên sabit ên berê Eren Keskin ji 47, Hüseyin Aykol ji 38 dosyeyan têne dadkirin.

Pêveka 1. Pêngavên mihakemeya cezayî

Mihakemeya cezayan ew pêvajo ye ku ji gumana sûcan dest pê dike heta biryarê didome. Dozgerên Komarê dikarin dozan vekin. Dozger bi çi awayî ji sûcekê dikevin gumanê?

- ew bi xwe,
- bi agehdarbûn ji karmendên civakê,
- bi rêya çapemeniyê,
- gilîya kesan,
- agahiyên ku ji wan kesên zerer ji sûcekê dîtî hatine standin

Kesên mexdûr **giliyê** dikin, kesên ku bi xwe ne mexdûr in, **giliya** sûcan dikin..

Lêpirsîn

Dema dozgerên komarê ji sûcekê bikevin gumanê lêpirsînê didin dest pê kirin. Lêpirsîn ew pêvajo ye ku ji dema aliyên rayedar ji sûcekê dikevin gumanê dest pê dike heta amadekirina îdianameyê didome. Dozger lêpirsînê bi rê ve dibin, dadger di vê pêvajoyê de kar nakin.

Ew kesên ku guman heye wan sûc kiribin gumanbar in.

Yanî ew kes in ku dema lêpirsînê de, di bin gumana sûcdariyê de ne. Di vê pêvajoyê de erkên dozgeran; dîtina delîlên sûcan û parastina wan e. Heke dozger bifikirin ku ji bo lêpirsînê pêwîst e, dikarin ji bo îfade-dayinê bangî gumanbaran, mexdûran an jî şahidan bikin.

Karê îfade-standinê(standina îfadeyê) hêzên ewlehiyê û dozger dikin karê **jêpirsînê** dadger dikin. (CMK 2/1-g ve 2/1-h)

Heke di dema lêpirsînê de guman hebe ku gumanbar dikarin delîlan tine bikin an jî zererê bidin kesan an jî cihan, dozger dikarin daxwaza girtin û desteserkirina gumanbaran bikin. Dozger dikarin biryara lêgerîn û destdaninê ji bo kesan û alavên wan ên wek kompîter, telefon, belge, hesabê bankeyan ...hwd bidin.

Desteserkirin, ew pêvajoya demkî ye ku li gor qanûnan azadiya kesên hatîn girtin bi awayekê saxlem û ewle tê astengkirin ku dozger ji bo wan biryarê bide an serbest bibe.

Di sala 2018ê de biryar hatiye dayin ku dema desteserkirinê bûye 48 siet. Di bûyerên komî de dema desteserkirinê dikare bibe çar roj. Dema desteserkirinê du caran dikare bê dirêjkirin.

Girti ew kes in ku ji bo wan biryara lêpîrsîn an jî pêçûnê hatiye dayin û azadiya wan hatiye astengkirin.

Piştî lêpîrsînê,

Heke dozger biryarê bidin ku têra dozek bê vekirin delîl tune ne, dikarin “biryara ne hevceyî peyçûnê ye” bidin. Heke biryarê bidin ku delîl têra vekirina dozan îdianameyan amade dikin û didin dadgehan.

Pêçûn, peyçûn

Dema dadgeh îdianameya dozgeran qebûl dikin pêvajoya pêçûnê dest pê dike. Sê pêngavên pêçûnê hene; amadekariyên ji bo rûniştina dadkirinê, dadkirin, dayîna biryarê. Di dema amadekariya ji bo dadkirinê de dozger dikarin delîlan li îdianameyê zêde bikin.

Piştî amadekariyan aliyên dadkirinê bi vexwendnameyan ji bo dema dadkirinê têne agehdarkirin.

Rûniştina dadkirinê, ew dem e ku ji dema xwendina navan dest pê dike heta biryarê didome. Di Mihakemeyên Cezayan de ji bo her rûniştina dakirinê celse tê gotin.

Di dema peyçûna dozê de ew kesên gûman heye wan sûc kirin bersûc in.

Di dema rûniştina dadkirinê de dozger delîlên xwe pêşkêş dikin û wek berpîrsên sûcan bersûcan nîşan didin. Varsa tanîklar ve bilirkîşî dinlenir. Bersûc û parêzer di rûniştinê de li hemberî sûcan “parastinê” dikin. Hemî axiftin ttêne qeydkirin.

Dema ku parêzer wan kesên ji sûceke zerer li wan bûyîn an jî ji aliyê maddî ve berpîrs in temsîl dikin navê wan “wekîl” e. Dema parêzer gumanbar an jî bersûcan li dadgehên cezayî diparêzin navê wan midafî” ye.

Nêrîna dawiyê

Piştî hemî delîl hatin eşkerekirin ji dozgeran “nêrîna dawiyê ya li ser dozê” tê xwestin. Tê pîrsîn ka wan nêrîna xwe guhertiye an na. Piştî nêrîna paşiyê ya dozgeran, cara dawiyê ji midafî û bersûcan tê xwestin ku ew xwe biparêzin.

Biryar

Piştî delîlên bi rêya hiqûqê hatin bidestxistin û nîşandan û piştî pêvajoya pêçûnê, dadger digihe qinaetekê û biryara xwe dîyar dike.

- Beraet,
- ne hewceyî cezadanê,
- mehkûmî,
- tedbîrên prastinê,
- redkirina dozê. (CMK 223).

Paşdedana eşkerekirina biryarê

Dema ku eşkerekirina biryarê tê paşdedan heke ew kesên biryar li ser wan hatî dayin di 5 salan de ti sûcan nekin, biryara li ser wan betal dibe. (CMK 231)

Mehkûmiya li derve, rê dide ku kesên mehkûm cezayê xwe li derveyê girtîgehan bikêşin.

Kontrola Edlî, di pêvajoya dozên ji bo wê biryar nehatî dayin de tê pêkanîn.

Nerazîbûn(îtiraz)

Pêvajoya piştî biryarê ye.

Îstinaf

Piştî biryara dadgeha pileya yekem di heft rojan de daxwaza îstinafê dikare bê kirin.

Ji sala 2016ê ve Dadgehên Herêman wek dadghehên pileya duyem kar dikin.

Ev dadgeh dikarin biryara dadgehên pileya yekem kontrol bikin, daxwaza îstinafê red bikin an jî biryara wan dadgehan betal bike û biryareka dî bide.

Temyiz

Piştî dadgehên herêmi biryar dayîn, heke bê xwestin ku nerazîbûn ji biryarê re heye. Di heft rojan re rêya temyîzkirinê vekiriye. Li Dadgeha Bilind daxwaza temyîzê tê kirin. Dadgeha Bilind ji aliyê hiqûqî ve li biryarê dinêre û kontrol dike.

Dadgeha Qanûna Bingehîn

Piştî sala 2010ê li gor qanûnên nû, welatî piştî nemana rêyên qanûnî dikarin di 30 rojan de serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn bide.

Ji bo vê yekê divê mafên li Qanûna Bingehîn û protokolên pêvek ên Hevpeymana Mafê Mirovan a Ewropayê hatibin binpêkirin.

Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê

Dema ku hemî rêyên qanûnî li welatî neman, ji bo mafên li Hevpeymana Mafê Mirovan a Ewropayê hatin parastin rêya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê vedibe.

Pêveka 2. Têgehên mihakemeya cezayan

Lêpîrsîn, pêçûn û girtin

Gelek girîng e ku têgehên Mihakemeya Cezayî bê zanîn. Ev têgeh her dem dê ji bo nûçeyan de kêrî me bên. Piraniya caran girtin û desteserkirin, desteserkirin û dema desteserkirinê, wekîl û midafî tevlihev dibin. Halbûkî wateya her yek ji van têgehên heye.

1. Li gor mihakemeya cezayan lêpîrsîn çi ye?

Ew pêvajo ye ku ji dema aliyên rayedar ji sêceke dikevin gumanê dest pê dike heta amadekirina îdianameyê didome.

(5271) Li gor Qanûna Mihakemeya Cezayan, ji bilî biryarên qanûnê eşkere kirin, mafê xwe-parastinê tê parastin û kiriyar û rêbaza dema lêpîrsînê nehênî ye.

Dema dozgerên komarê ji sêceke bikevin gumanê lêpîrsînê didin dest pê kirin. Ev pêvajo nehmnî” ye.

2. Pêçûn û rûniştinên dadkirinê ne nehênî ne

Pêketin, peyketin: Ew dem e ku ji qebûlkirina îdianameyê dest pê dike heta eşkerekirina biryarê didome.

Dema îdianameya dozgeran bê qebûlkirin doza civakî tê vekirin. Êdî pêvajoya “pêçûnê” dest pê kiriye. Lêpîrsîn nehênî ye lê “pêçûn” eşkere ye. Heta ku dadgeh biryara nehênîbûnê nede dadgeh ji bo her kesan vekiriye.

3. Gumanbar, bersûc û mexdûr kî ne?

Gumanbar: Ew kes in ku dema lêpîrsînê de, di bin gumana sêcdariyê de ne. (Xala 2.)

Bersûc: Ew kes in ku ji dema pêketinê heta heta dayina biryarê/hikimî, di bin gumana sêcdariyê de ne. (Xala 2.)

Mexdûr: Ew kesên ji ber sêceke an jî kiriyarekê neheqî li wan hatin kirin in.

Halê metirsiya derenbûnê heyî, ew hal e ku heke demildest ti kiriyar nebin çêdibe ku delîlên sêcan bêne tinekirin, gumanbar birevin an jî rewş biguhere û nasnameya gumanbaran ji ber vê yekê neyê eşkere kirin.

Xala 2. a Qanûna Mihakemeya Cezayan(CMK):

CMK XALA 2. : - (1) Ji bo bicihanîna qanûnê:

- a) Gumanbar: Ew kes in ku dema lêpîrsînê de, di bin gumana sêcdariyê de ne.
- b) Bersûc: Ew kes in ku ji dema pêketinê heta heta dayina biryarê/hikimî, di bin gumana sêcdariyê de ne.
- c) Midafî: Parêzerên bersûc û gumanbaran in ku ji bo mihakemeya cezayan wan diparêzin.
- d) Wekîl: Ew parêzer in ku temsîliya beşdar, yê ji ber sêcan zerera wan bûyîn û berpîrsînê malî dike.
- e) Lêpîrsîn: Lêpîrsîn ew pêvajo ye ku ji dema aliyên rayedar ji sêceke dikevin gumanê dest pê dike heta amadekirina îdianameyê didome.
- f) Pêçûn: Ew dem e ku ji qebûlkirina îdianameyê dest pê dike heta eşkerekirina biryarê didome.
- g) Standina îfadeyê: Ew dem e ku

- aliyên ewlehiyê an jî dozgerên komarê li ser sêcan guhdariya bersûcan dikin.
- h) Jêpîrsîn: Ew pêvajo ye ku li ser sêceke dadgeh an jî dadger guhdariya gumanbar an jî bersûcên sêceke dikin.
- i) Barhilgirên malî: Ew kes in ku barê malî(maddî) yê heta biryardanê li ser wan e. Ew kes in ku bandora maddî li wan dibe.
- j) Li-ser-sêcî:
 1. Sêcê ku hêj tê kirin,
 2. Ew rewş e ku sêcê nû hatiye kirin, hêzên ewlehiyê, ew kesên ji sêcî zerer li wan bûyîn an jî kesên dî hin kes şopandine û ew girtine.
 3. Kiriyara di wextekê nêzikde hatî kirin û digel kesan heyîna delîlên sêcî
- k) Sêcê komî: Ew sêc in ku sê an jî zêdetir kesan kiriye. Çêdibe hevkarî di navbera sêcdaran de nebe.
- l) Disiplin hapsî: Kîsî bir dîzenî korûmak amacîyla yaptırım altîna alınımış olan fiil dolayısıyla verilen, seçenek yaptırımlara çevrilemeyen, ön ödeme uygulanamayan, tekerrüre esas olmayan, şartla saliverilme hükümleri uygulanamayan, ertelenemeyen ve adli sicil kayıtlarına geçirilmeyen hapsî, ifade eder.

4. Zeftkirin û kiriyarên ji bo kesên zeftkirî

4.1. Zeftkirin

Di van rewşan de ji bo her kesan biryara zeftkirinê ji bo demekê kurt dikare bê dayin:

1. Dema bê dîtin ku kesek an hin kes sûcan dikin.
2. Dema ji bo girtina li-ser-sûcî kesek tê şopandin ihtimal hebe ku bireve, dema ti rê nebin nasnameya kesekî/ê bê zanîn.

Di wan rewşan de ku divê “fermana zeftkirinê” bê dayin lê ew derfet nebin ku fermanberên hêzên ewlehiyê ji dozger û fermandarên xwe bipirsin, ew bi xwe dikarin karê zeftkirinê bikin.

Qaîde ev e: Dema gilîyek bê kirin karê lêpîrsîn û pêçûnê dikare bê kirin. Digel ku qaîdeya giştî ev e lê heke li ser sûcê li hemberî zarokan, kêmendaman, hezar û lawazan kes bèn dîtin endamên hêzên ewlehiyê dikarin wan zeft bikin.

Piştî ku endamên hêzên ewlehiyê kesan dikirin, diêxin di bin kontrolê de ku nekare zererê bide xwe û yê li derdora xwe hingê divê mafên zeftkirîyan bibêjin.

Dema kesek bê girtin û teslîmî hêzên ewlehiyê bêne kirin an jî

dema ku hêzên ewlehiyê bi xwe hin kes zeft kirin divê demildest Dozgerên Komarê agahdar bikin û li gor fermanên wan tev bigerin.

Dema ku armancên ji bo zeftkirinê nemînin, Dadgeh, Dadgerî û Dozgerîya Komarê demildest fermanê betal dikin. (CMK Xala 90).

4.2. Desteserkirin

Piştî zeftkirina kesekî/ê Dozgerîya Komarê dikare biryara berdanê an jî biryara desteserkirinê bide.

Li gor nîşanên sûcdariyê biryara desteserkirinê tê dayin û lê tê nêrîn ka ji bo lêpîrsînê ev yek pêwîst e an no.

Dema ku kes bi komî bêne desteserkirin, komkirina delîlan zehmettir dibe û pirtir wext jê re divê. Dozgerên Komarê dikarin, biryarê bidin û dema desteserkirinê herî zêde rojekê dirêj bikin. Dozger dikarin pey hev sê rojan her car ji bo rojekê vê fermanê bide.

Piştî kesek hat zeftkirin, heke dozger biryara desteserkirinê an jî biryara dirêjkirina dema desteserkirinê bide parêzerên midafî an jî mirovên di asta yekem de lêzimên zeftkiriyan an jî desteserkiriyan dikarin daxwaza

berdana wan ji Dadgerîya Cezayan bikin. Dadgerî divê di 24 sietan de bersivê bide.

Heke dadgerî biryarê bide ku biryara desteserkirinê an jî dirêjkirina dema desteserkirinê di cih de ye. Serlêdanê betal dike.

Piştî ku bi biryara Dadgerîya Cezayan biryara desteserkirinê ji ser kesekî/ê rabe, heta dozgerî biryareka nû nede, çênabe ji ber heman sedemê ew kes bêne desteserkirin. (CMK Xala 91.)

4.3. Sedemên girtinê

Dema ku bi awayekê xurt guman hebe ku bersûc an jî gumanbarekê/î sûcek kiriye çêdibe ji bo wî/wê biryara girtinê bê dayin.

Di van rewşan de çêdibe ku biryara girtinê bê dayin:

- a) Heke nîşan hebe ku gumanbar an jî bersûc dikarin birevin an jî xwe veşêrin.
- b) Tevgerên gumanbar an jî bersûcan;
 1. Hewildanên ji bo veşartin, tinekirin an jî guhertina delîlan,
 2. Gumaneka xurt hebe ku dê li ser mexdûr, şahid an jî kesên dî guvaşê çêbike...

Di rewşên ceza yê maddî tê dayin an jî ceza yê herî zêde

ji salekê ne zêde be de, biryara girtinê nayê dayin. (CMK Xala 100).

4.4. Biryara girtinê

Di dema lêpîrsînê de bi daxwaza dozgerên komarê, dadger biryara girtinê didin. Ji bo dozên hatîn vekirin bi daxwaza dozgerên komarê dîwana dadkirinê biryarê dide.

divê sedemên biryara girtinê yê hiqûqî û fîlî bêne nîşandan. Naveroka biryarê ji bersûcan re tê gotin. Bi awayekê nivîskî ji bo wan tê nîşandan. Piştî biryara girtinê bersûc an gumanbar dikarin ji xwe re midafiyekê hilbijêrin. An jî Baro dikarin midafiyekê erkdar bikin.

Biryara girtinê ji bo lêzimekê/a girtîyan an jî keseka/ê girtîyan bi xwe navê wan dayî têne agehdarkirin.

Dema kesekê/a biyanî bê girtin. Heke ew bi xwe daxwaznameyeka nivîskî nede û diyar neke ew naxwaze balyozxaneya welatê wî/wê jê agehdar bibe, dadgeh balyozxaneya welatê wan ji biryara girtinê agehdar dikin. (CMK Xala 107.)

Di hemî pêngavên lêpîrsîn an jî pêçûnê de bersûc an jî gumanbar

dikarin daxwaza serbestbûnê bikin. Dikarin nerazîbûna xwe ya ji bo biryara girtinê diyar bikin. Dadgeh an jî dadger dikarin biryara neguhertina halê girtîbûnê bidin. Gumanbar an jî bersûc dikarin ji bo vê yekê jî nerazîbûna xwe diyar bikin.

Di her 30 rojan de carekê li biryara girtîbûnê tê nêrin. Di dema lêpîrsînê de ji bo girtîyan her 30 rojan carekê bi daxwaza dozgeran dadger biryara girtin an jî berdana girtîyan nû dikin. (CMK Xala 108.)

4.5. Dema girtîbûnê

Ji bo dozên ne li dadgeha cezayên giran, dema girtinê herî zêde dikare salek be. Lê belê di hin rewşên neçar de, dikare sedema wê bê diyarkirin û heta şeş mehan bê dirêjkirin. Di dozên dadgehên cezayên giran bi rê ve dibin de dema girtîbûnê dikare herî zêde du sal bin. Di rewşên mecbûrî de ev dem dikare bê dirêjkirin. Divê sedema dirêjkirinê bê eşkerekirin. Dema dirêjkirinê herî zêde dikare sê sal bin. Biryara dirêjkirina dema girtîbûnê, piştî dozgerên komarê, midafiyên bersûc û gumanbaran û gumanbar û bersûcan bi xwe fikra xwe diyar dikin tê dayin. (CMK XALA 102).

Dadgehên erkên taybet heyîn, dikarin van deman du qet dirêj bikin.

4.6. Îfade çawa tê standin jêpîrsîn çawa tê kirin?

Rêbaza îfade-standin û jêpîrsînê ev e:

1. Nasnameya gumanbar an jî bersûcan tê piştrastkirin. Gumanbar an jî bersûc ji pîrsîn li ser nasnameya xwe berpîrs in, divê bersivên li ser nasnameya xwe bidin.
2. Sûcên li wan tê barkirin ji wan re têt gotin.
3. Ji wan re tê eşkerekirin ku ji bo alîkariya hiqûqî mafê wan heye midafiyekê/î ji xwe re hilbijêrin û midafî jî beşdarî jêpîrsînê bibin. Dema ku ne di wê rewşê de be ku bikare ji xwe re midafiyekî/ê hilbijêre, Baro dikare midafiyekî/ê erkdar bike.
4. Ji bilî îstisnayan. Dema kesek bê girtin, xizmê girtî dixwaze bê agehdarkirin demildest tê agehdarkirin.
5. Tê gotin ku mafê wê/wî heye ku li ser sûcî bersivan nede.
6. Jê re tê gotin ku ji bo ji gumanê rizgar bibe dikare komkirina delîlan bixwaze. Derfet tê dayin ku mijarên di berjewendiya xwe de pêşkêş bike û gumana li dijî wî/wê rake.

7. Agahiyên li ser rewşa kesane û rewşa aborî ya kesên îfadeya wan tê standin an jî jêpîrsînê tê kirin tê nivîsîn.
8. Ji bo îfade-dan û jêpîrsînê îmkanên teknîkî têt bikaranîn.
9. Îfade û jêpîrsîn li qeyda fermî(zabitname) tê nivîsîn. Di zebitnameyê de ev mijar hene:
 - Cih û dîroka îfade hatî standin.
 - Nav û wesfê wan kesên di dema îfadedanê de hazir bûne û nasnameya yên îfade dane tê nivîsîn.
 - Tê diyarkirin ka ev kiriyarên li jor hatine pêkanîna na. Heke nehatibin pêkanîn sedemên wê tê diyarkirin.
 - Midafiyê/a ku dema yê/ya îfade dayî an jî yê/ya jê hatî pîrsîn îfadeyê dixwîne û îmze dike.
 - Heke îmze neyê avêtin sedemên wê tê nivîsîn. (CMK Xala 147.)

4.6.1. Rêbazên qedexeyên dema îfade-standin û jêpîrsînê çi ne?

Divê beyana gumanbar an jî bersûcan bi îradeya wan a azad be. Çênabe ti kiriyarên vê yekê asteng bike bêne kirin. Çênabe bi tevgerên xerab îfade bêne standin çênabe îşkence bê kirin, tehdîd bê kirin, midaxelayên bedenî an jî

rûhî bêne kirin an jî derman bêne dayin. Berjewendiyeka neqanûnî ji bo wan nayê we'îdkirin. Heke dema îfade-danê midafî ne hazir be. Heta li dadgehê di hizûra dadgeran de bersûc îfadeyê qebûl neke îfade nakeve di rewacê de. Heke rewşeka welê çêbibe ku hewce be îfadeya gumanbaran dîsa bê standin, vê yekê dozgerên komarê dikin. (CMK Xala 148.)

4.6.2. Alîkariya Midafiyên

Gumanbar an jî bersûc dikarin di hemî pêngavên lêpîrsîn an jî pêçûnê de alîkariyê ji midafiyên bistînin. Heke nûnerekê/a qanûnî hebe ew jî dikare ji bo gumanbar an jî bersûcan midafiyên hilbijêrin. Di pêvajoya lêpîrsînê de ji bo îfade-danê herî zêde sê parêzer dikarin beşdar bibin.

Di hemî pêngavên lêpîrsîn an jî pêçûnê de, mafê parêzeran heye ku bi gumanbar an jî bersûcan re hevdu bibînin, di dema îfade-danê de li nik wan be û alîkariya hiqûqî bide, ev mafê parêzeran nikare bê astengkirin. (CMK Xala 149).

Ji bersûc an jî gumanbaran tê xwestin ku ew ji xwe re midafiyekê/î hilbijêre. Heke bersûc an jî gumanbar diyar bike ku ew ne di wê rewşê de ye ku bikare ji xwe

re midafiyekê/î hilbijêre hingê
midafiyek tê erkdarkirin. Heke
guamnbar an jî bersûc: zarok be,
kêmendami, lal an jî ker be, ne di
wê rewşê de bin ku bikarin xwe
biparêzin, bêyî ku ji wan bê pirsîn
midafiyek tê erkdarkirin. Ji bo
sûcên cezayê herî kêrêm şêş sal in, li
gor şertê duyem bêyî ku bê pirsîn
midafî tê erkdarkirin. Rêbaza ji bo
midafîtiya mecbûrî li gor nêrînên
Yekîtiya Baroyan ya Tirkiyeyê tê
pêkanîn(CMK Xala 150).

Çavkanî

Adalet Barometresi: Vatandaşların
Mahkemeler Hakkındaki Görüşleri
ve Değerlendirmeleri, İstanbul Bilgi
Üniversitesi Yayınları, İstanbul,
Sibat 2008.

Aşıcıoğlu, Faruk; Arslan, Murat;
Nihat ve Dokurur, Semih, Meraklılar
ve Hevesliler için Adli Bilimler,
Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları,
İstanbul, Tirmeh 2012.

Böll, Heinrich, Katharina Blum'un
Çiğnenen Onuru, 10. basım, Can
Yayınları, İstanbul, 2017.

Tunç, Aslı, Türkiye'de Yazılı Basının
Yargıya İlişkin Haberleri Sunumu,
Kalem, Seda (der.), İstanbul Bilgi
Üniversitesi Yayınları, Sayı 283,
Kanûna Pêşiyê, 2009.

Yücel, Özge, Çocuğun Kayyım
Tarafından Temsili, Turhan
Yayınları, Ankara, Nisan 2011.

Malper

Adalet Bakanlığı Ceza ve
Tevkifevleri Müdürlüğü, 2018 Yılı
Ekim Ayı İstatistikleri.

Adalet Bakanlığı Ceza ve
Tevkifevleri Müdürlüğü, Ceza İnfaz
Kurumu Genel Bilgi.

Adalet Bakanlığı Ceza ve
Tevkifevleri Müdürlüğü, Yıllara
Göre İstatistikler.

Adalet Bakanlığı, Yakalama,
Gözaltına Alma ve İfade Alma
Yönetmeliği, 1 Haziran 2005.

Adli Sicil ve İstatistik Genel
Müdürlüğü, Adalet İstatistikleri,
2017.

Akgül, Elif, Hrant'ın Arkadaşları:
Gerçeğin Bir Kısmını Değil,
Tamamını İstiyoruz, 29 Ocak 2018.

Avrupa Konseyi, Avrupa İnsan
Hakları Sözleşmesi, 2010.

Avrupa Konseyi, Prisons in Europe
2005-2015 (1), Aralık 2018.

Avrupa Konseyi, "Ceza
Yargılamalarının Yayımlanmasına
İlişkin Hukuki Kuralların
Düzenlenmesi" ile İlgili Tavsiye
Kararı No. R, 2003.

BîA Haber Merkezi, Barış Akademisyenlerinin Beyanları.

BîA Haber Merkezi, İHD: 402'si Ağır, 1154 Hasta Mahpus Var, 2 Mart 2018.

BîA Haber Merkezi, Sarraf: Çağlayan'a Rüşvet Veriyordum, Hakan Atilla Rüşvet İstemedi, 30 Kasım 2017.

bianet, Akademisyen Yargılamaları.

bianet, BîA Medya Gözlem Raporları 2001- 2019.

Dede, Ersoy, Şortlu kıza tekme ve başörtülü kadına yumruk, 3 Kasım 2014.

Diken Haber Merkezi, BİM'den 'Ürünler sahte' diye ihtarname çeken Apple'a: Bilirkişi 'Oriijinal' dedi, 31 Ağustos 2018.

Evrensel Haber Merkezi, "Bakanlık açıkladı: 3 bin 13 çocuk cezaevinde", 14 Kasım 2018, Evrensel.

Hürriyet, Adnan Oktar Haberleri.

Hürriyet, Şule Çet'in ölümüyle ilgili soruşturma tamamlandı: Savcılık 'cinsel saldırı ve cinayet' dedi, 3 Aralık 2018.

İlkiz, Fikret, Avukat Gözünden Yargı Haberciliği, 17 Ağustos 2018.

İrvan, Süleyman, Gazetecilik Etiği: "İsmlerin Kodlanması ve Fotoğrafların Buzlanması Kılavuzu" Üzerine, 5 Eylül 2017.

Karabağlı, Hülya, t24.com, 14 Kasım 2018, Cezaevlerinde 3 Bin Çocuk Var Tutuklu Öğrenci Sayısı ise Bin 848'i Buldu.

Korkmaz, Serhat, 5 Nisan 2012, "Elin Ayağın Titremesin Evren, Buraya Gel!"

Osman Kavala'ya Özgürlük.

Önderoğlu, Erol, BîA Medya Gözlem, 22 Ekim 2018.

Polat, Metin, Avukatın soruşturma dosyasını incelemesi nasıl olur?, 19 Şubat 2018.

Sputnik Haber Merkezi, Şortlu kadına tekme atan Çakıroğlu'nun cezası belli oldu, 7 Eylül 2017.

Sugarman, Saul, How to cover a court trial: 6 tips for journalists, Poynter, 2013.

T24 Haber Merkezi, Cezaevlerinin Doluluk Oranı Kapasitenin 40 Bin Üzerinde, 14 Kasım 2018

Tahaoğlu, Çiçek, 1. Derece Yakını Olmadığı İçin İdil Eser'in Cezaevinde Görüş Hakkı Yok, 26 Temmuz 2017.

Tarcan, Pınar, Adam Klasfeld: Sarraf Davasından Tweet'lerle Sansürlü Bilgiye Olan Açlığı Giderdik, 14 Aralık 2017.

Tahincioğlu, Gökçer, Gazeteci Gözünden Yargı Haberciliği, 16ê Tebaxa 2018ê.

Tunç, Aslı, Akademisyen Gözünden Yargı Haberciliği, 15ê Tebaxa 2018ê.

Türk Hukuk Sitesi, CMK Madde 100.

Türkiye Gazeteciler Cemiyeti, Türkiye Gazetecilik Hak ve Sorumluluk Bildirgesi.

Türmen, Rıza, Hukuk Devletinin Sonu, 2 Aralık 2018.

World Prison Brief, World Prison Population List, 1Bergê 12ê.